

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn



Kurdê ku herî zêde ermenî xelas kirine, Muhtila Begê Moksî

Du parçenivîs bi kurdiya şêxbizînî

8ê adarê, roja jinan

45

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 45, bihar 2010

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/lişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanyaya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanyaya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Rohilatnas û kurdnasê navdar Orbeli, dostê Muhtila
Begê ku 4 459 ermenî ji mirinê xelas kirine.

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li
xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



- 2 Ji Bîrnebûnê – *Ali Çiftçi*
- 4 Ruje 21 mange reşemî (gûcig) ke UNESCO rujî zwangelî dûnya
hûzan kird, şêxbizingel la Engûrî gurdo vî – *Brang Şêxbizinî*
- 7 Newrozeke bêxwîn – *Mem Xelikan*
- 9 8ê adarê, roja jinan – *Altun Başaran*
- 10 Kurdê ku herî zêde ermenî xelas kirinel!
Muhtila Begê Moksî – *Rohat Alakom*
- 21 Hevpeyvîn – *Brang Şêxbizinî*
- 25 Yaranî – *Ecevit Yildirim*
- 26 Du parçenivîs bi kurdiya şêxbizinî – *Xamgelî Bane*
- 28 Zehakê Marmil – *Abmed Milanî*
- 38 Bi dizikî, hezkirin û dilketin – *Nûh Ateş*
- 40 Wêne – *Seyfi Dogan*
- 45 Danê nîvro – *Seyfi Dogan*
- 47 Lê lê esmera çavşîn – *Xizan Şilan*
- 49 Çar par – *Gurdo*
- 49 Tilîliyên gernasana – *Şivan Ar*
- 50 Nasnameya veşartî – *Nuh Ateş*
- 53 ÇANAKKALE'DEKİ ORTA ANADOLU'LU KÜRT MEMO'LAR – *Muzaffer Özgür*
- 63 19. YÜZYIL BAŞLARINDA DERSİM'DE OSMANLI KATLIAMI – *Mehmet Bayrak*
- 67 DEVLET KÜRTÇE'YE KAPILARI AÇTI,
YA BİZ ORTA ANADOLU KÜRTLERİ? – *Dr. Mikailî*

Bi destpêka biharê re li welatê me gelek bûyerên balkêş qevimîn. 16ê adarê, roja Heleqçeyê li seranserê welêt û li dunyayê hema hema wek rojeka navnetewî hat bi bîranîn.

Newroza îsal ji ber ku tu mudaxleyên provokatîv ji aliyê dewletê ve, li bakûrê welêt nehatin kirin di atmosfereka xweş de derbas bû. Li başûrê welêt, li Iraqa Federal di 7ê adarê de hilbijartin çebûn. Herçiqas kurdan li bajarên xwe bi hejmareka bilind tev li hilbijartinê bûn jî ji ber bêyekitiya li hember partiyên ereban nikaribûn di parlamentoya Baxdayê de bi hejmareka bilind temsîliya xwe biparêzin. Berî hilbijartinê hejmarek parlementerên meclîsê ji 275an derxistin 325an, yanî 50 parlementerên ereba lê zêde kirin û temsîliya bajarên kurdan wek xwe ma. Partiyên ereban, şîa û sunî ku her şerê hevdu dikin di vê noqteyê de li hember kurdan bi yekdengî ev pêşniyara erê kiribûn. Li gor sîstema berê kurdan di parlamentoya Baxdayê de ji sedî 21 temsîlî dikirin, anîha ew daketiya %17an. Ev jî tê wê maneyê ku siyaseta ereban li Baxdayê li hember kurdan nehatiye guhartin. Hîle û xepandina kurdan hê jî li başûrê welêt li rojevê ye! Li hember vê rewşa nû ya li Baxdayê divê hemû partiyên kurdan xwediyê yekhelwesteka netewî bin.

Li Tirkîyê jî bûyerên balkêş rûdidin. Hikumeta AKP li dijî mîlîtarîstên ku hazirîya darbê dikirin û ergenekonçî bi rêya yasayê derxistin ber mehkemeyan û çend general û ergenekonçî heps kirin. Di eynê wextê da jî tu dibîni berê xwe dane kurdan û ew hêvî û gavên bi "*açilîma*" xwe ve avêtibûn wek ku paşde gav bavêjin, rojevê digarin.

Tiştê balkêş ew e ku ev hukumeta AKP jî bo endametiya YEyê dixwaze hinek gavên demokratîk bavêje. Rast e, hinek gavên ku di dîroka Tirkîyê de em rastê nehatine, têne

avêtin. Ev heyecanekê jî dide însanên me yên kurd! Lê dema em bala xwe didinê, jî bo ku li Tirkîyê demokrasî û mafê însanan bên dayîn û bi rêya yasayê bên parastin, tu hewldaneka berbiçav nexuyaye!

Di vê demê de divê kurd jî xwedî yekhelwesteke bi plan û daxwezên vekirîbin. Hinek tabû hatine rakirin. Destkewtiyên çiqas biçûk bin jî divê em xwedî lê derkevin û wan tabûyên ku hatine şikeştin bi daxwaz û hewildanên xwe hê ber bi pêş bibin û em çî dixwazin, bi cesaret ji dewletê bixwazin.

Şêxbizîni li herêma Anatoliya Navîn, bi Heymaneyê tên nasîn. Kovara me heta niha çend caran li ser şêxbizîniyan nivîs belav kirin. Di hejmarên 3, 4, 5 an de li ser zimanê şêxbizîni, birêz Mahmud Lewendî zincîrenivîs nivîsiye. Di hejmare 3an de bi fereyê, li ser lehçeya şêxbizîni lêkolaye. Di hejmare 6, 7, 8an de bi wergera Fewaz Husên, bi sernivîsa *Kurdên Haymannayê-I, II, III* lêkolîneka hêja ya George Perrot hat belav kirin. Dîsan di hejmare 41an de birêz Nuh Ateş bi sernivîsa li ser *Şêxbizîniyên Haymanayê û koka navê wan* lêkolînek belav kir.

Em bi dilşayî xêrhatina hevalên wek Brang Şêxbizîni û Xamgelî Bane dikin ku bi nivîsên xwe tevli berhevkirina folklorê kurdî ya lehçeya şêxbizîni dibin. Li vir em hêvî dikin ew kesên ku dixwezin bi lehçeya şêxbizîni binivîsinin, dikarin ji wan hejmarên kovarê ku me li jor destnîşan kirî, jê fêyde bibînin. Bi taybetî di hêla rastnivîsînê de. Herwiha em bi xeberên ku li Anqerê kurdên me yên şêxbizîni bi munasebeta 21ê Sibatê roja zîmkakî civîyane, pir pê dilşa bûn. Hûn dê di vê hejmarê de xeberê vê civîna dîrokî bixwînin.

Birêz Mem Xelikan bi sernivîsa *Newrozeka bêxwîn* li ser Newrozê dîtîni û hêviyên xwe

nivîsiye. Hêviya wî heta derecekê rast derket. Me îsal Newrozeka bêxwîn û serkeftî li bakûrê welêt derbas kir.

Bi sernivîsa *8ê adarê, roja jinan*, Altun Başaranê bi serpêhatiya pîrejîneka ji Anatoliyê rastiya jiyana jinê nivîsiye.

Ji dîroka sedsala dawî rûpeleka ku em kurd pê serbilind bin, bi sernivîsa *Kurdê ku herî zêde ermenî xilas kirine; Muhtila Begê Moksî* lêkolîneka aktuel birêz Rohat Alakom hazir kiriye. Bi biryarên komkujiyên ermenîyan ji aliyê 21 welatên Ewropa û Amerikayê ve hatine qebulkirin, aktualîteya xwe berdewam e.

Brang Şêxbizîni hevpeyvînek bi dengbêjê hêja Şevket Kagitçi re, bi lehçeya xwe kiriye. Birêz Şewket di vê sohbeta xwe de bi kurtî hem li ser şêxbizîniyan agahdariyê dide û hem jî xwe dide nasîn.

Ecevit Yildirim, sê yaranîyên civaka kurdên Anatoliyê bi zimanekî zelal nivîsiye.

Bi sernivîsa *Du parçenivîs bi kurdiya şêxbizîni* Xamgelî Bane bi kurdiya şêxbizîni kurtenivîs û helbestek bi wergera tirkî amade kiriye.

Li ser mîtolojiya me kurdan pir kêr lêkolîn ji teref kurdan ve hatine kirin. Li ser Newrozê birêz Ahmed Milan ku bi xwe ji kurdên rojhilat e, ji çavkaniyên fars û kurdan kurtelêkolînek bi navê "*Zehakê Marmil*" ku li ba me wek Dehak bi lêv bûye, nivîsiye.

Birêz Nuh Ateş bi sernivîsa *Bi dizikî hez- kirin û dilketin*, li ser hinek edetên me yên berê, bi zimanekî îronî ku ev kevneşopiya li ser hezkirin û dilektinê çawa hatiye şikeştin, rawestiyaye.

Birêz Seyfî Dogan bi wênêkî li ser folklor û kultura me ya berê ya daweta çing dibû bi bîranîneka xwe ya gundê Xelika û bi zaravê xelika nivîsiye. Herwiha bi wê re jî çend merivên gundê Xelika yên wek Huco ku xweş zurne lêdixistiye, bi bîr tîne.

Seyfî Dogan, endamê redaksiyona kovara me, îsal bo serokê partiya Sosiyaldemokrat,

SAP (*Sveriges Arbetar Partiet*) li Vällingbyê hatiye hîlbijartin û herwiha li herêma Hässelby -Vällingbyê jî endamê meclîsê ye (Meclîsa belediya herêmi). Em li vir wî pîroz dikin.

Dîsan birêz Nuh Atêş bi bîranîneka xwe ya dema mektebê, bi sernivîsa *Nasnemeya veşartî* serpêhatiyeke xwe ku pîraniya xwendevanên me yên kurd ku dikarin xwe têda bibînin nivîsiye. Bîranîneka di pir alîyan de balkêş e. Bi ya min divê her xwendewaneka/i kurd ku li bajarên tirkî çûne mektebê bîranînen xwe yên wiha binivîsin.

Muzaffer Özgür bi sernivîsa *Çanakkale'deki Orta Anadolu'lu Kürt Memo'lar* bi tirkî lêkolînek li ser kurdên Anatoliyê ku di şerê cihanê ya yekemîn de li cephê Çanakkaleyê şehîd bûne bi çavkaniyên resmî yên dewletê hazir kiriye.

Mehmet Bayrak bi lêkolînen xwe yên dîrokî yên li ser kurdan naskirî ye. Di vê hejmarê de bi navê *19. yüzyıl başlarında Dersim'de Osmanlı katliamı* dîsan bi tirkî lêkolîneka pir balkêş a dokumenter, ji çavkaniyên dîrokî yên ji arşîvên osmanî û ewropîyan derxistiye. Di vê lêkolînê de jî em disan dibînin ku osmanîyan çawa mesela dîn li hember kurdan bi kar anîne û qetlîama kurdan kirine. Osmanîyan ew serleşkerên ku li Kurdistanê qetlîam kirine çawa terfiye kirine. Di wê lêkolînê de Yusuf Ziyaeddin Paşa ye kor ku piştî sefera xwe ya hecê di dema Selimê sisîyan de li Kurdistanê wek walî tê şandin û li herêma Dersimê qetlîamên kurdên "Kizilbaş" dike.

Birêz Dr. Mikailî "*Dewlet Kürtçe'ye kapıları açtı, ya biz Orta Anadolu Kürtleri?*" Di vê gavavêtina dewletê ku ji bo zimanê kurdî rê vekirîye, em wek kurd dikarin çî bikin, ditînen xwe vedibêje û hinek pêşniyaran dike.

Heta hejmarê tê, her bextewar bin!

Ali Çiftçi

Ruje 21 mange reşemî (gûcig) ke UNESCO ruji zwangelî dînya hûzan kird, şexbizingel la Engûrî gurdo vîn

Birang Şexbizinî



Zwannase birêz Sadik Varli, azmayiker dîroke şexbizinî Hamdi Çeker û azmayîkere zwan û dîroke Şexbizinî û şehriyare wercêyîne Balçıkhisar Kazim Ergenli tev we panela vîn. Le yî panela bername we zwanê tirkî û kurdî şexbizinî hate pêşkeş kirdin.

We teybetî şexbizingelî Heymane û gişti tevo vîn we yî panela xeylî firewanî vî.

Le yî panela le ser wercêyîne xêyan, dîr keftine le welate xêyan û hatinîyan we Anatolia nawrast, akrire lehce û şûne yî lehce le naw zwanê kurdî, û zindiganî le naw dewlete Osmanî hate qalkirdin we qiseyî dûye ji sew zwan û kulture şexbizinî ça dîyay we kirdin hate pirsandin.

Henî ja karargelî ke le yî panela hatina algirtin ewanan ke şexbizingel le bin çatîyî



Şexbizengel la Engûrî gurdo vîn

we yek awirdin, we sazkirdinî festîval û
şexbizingel gurdo yek kirdin, le ser gûranî
û zwan azmayî kirdin. Û we dûye le zwane
kurdî şêxbizinî amade kirdine kovar, fer-
heng, gurdo kirdine henasig.

ÎME

Nêzanim min kîm,
Je ku çun hatiyim?
Je kan kuyel xericîyayim?
Le kan çemgel qelivîyayim?
Le ku nayim?
Çiqinê çun wokirdiyim u çê jê xwardiyim?
Çiqesi ruya ve pîyavî çiqesê ve sor çiyim
Ve çê kenîyim
Ra çê yîristiyim
Kênîyeleke jê aw xwardiyim are vîrime nêzanim?
Îmeyel je dur hatîyîne îre
Le îre kono vîyîn
Zaruman vîye
Harimiman hest
Mîrg ve xawind kirdîyîn
Hewşî yirtîyîn
Rûngeli pes le çul leverandîyîn
Girî çêwîman rişîya ban ey xakele
Le îre le seri seygel ceng kirdîyîn
Zarugeliman le îre gewro vîye

We le ser projeyelî wek radyo û TV
ji hate qise kirdin û era care dik ji sew
vîrandine yek dinî karar hate elgirtin.

Panela we helwestê Xamgelî Bane
hate xilas kirdin.

Dûtgeliman dayîne şu
Le surgeliman sîn sîn xwestîyîn
We kergelo çiyîne fêzgel
Le îre nawi çule nayîn
Rindêkuşîyaw, Payzexêre, Bukilê
Gîlalê sûre, Hewşiyeli ma Komane
Îme le îre kenîyîn
Le îre govend kîşayîn
Xaniy girtîyîn je kuçik
Aw kîşayîn je kêni diye
Malîkêtêtê xwestîyîn ve şew
Sersalî rikirdîn le seri sale
Pîjok riçinandin le nav zîyane
Le bilbizê riyerdîyan le seri kuyel
Dildariman hewî le diyeman
Yekcar dotî hamse vî
Yekcar dotî dijmin
We gurzo nujî ridizîyayn
Hêlingeli cuciygel hak jê riderxistîn
Îme ke çeman hewî gî le ey xakeli diye wî
Şawîne man, îşane man



Dîsan xakeli welateman je vîr nekirdîn
Kuyel û keşgelê le veri çewgeliman
Re xewgeliman
Je vîr nê vu welat
Ewî re hevîreman
Re xuneman
Guşt u naxune jeyek ri vu ke
Îme jî je zwane u welateman vivîn

Xamgelî Bane

Yazıda kullanılan sözcüklerin karşılığı:

gurd: toplu
gurd wîn: toplanmak
azmayî kirdîn: araştırmak
azmayiker: araştırmacı
huzan: ilan
huzan kirdîn: ilan etmek
zwannas: dilbilimcisi
şehriyar: belediye başkanı
tev vîn: katılmak
taybet: özellik
akrîr: ilgili
zindiganî: yaşam
sazkirdinî: kutlamak
henasig: masal/hikaye
dûya: arka
qise: söz
vîrandin: görmek
elgirtin: almak
nawrast: orta
qa: bahis/bahsetme
frêwan: çok/çoğunluk
ime: biz
xam: ham
rûn: dawar /sürü

mirg: tavuk
gewre: büyük
sur: düğün
nayîn / nayandin: indirmek / ad koymak
kuçîk: taş
malikê tete: bir oyun türü
pijok: çiğdem
ziyan: ekin
gurz: demet
nujî: mercimek
xak: toprak
hamse: komşu
hak: yumurta
kû/ko: dağ
qelivandin aşmak
sor: binek
wokirdin: açmak
ruye: yol
pîyav: yayan
kone: eski
kono vin: eskimek
xawind: sahip
pes: koyun sürüsü
sey: köpek
dot: kız
girtin: tutmak
xaniy girtin: ev tutmak
zan: bilmek
xericîyay: geçmek
çi qe: ne kadar
yîristin: ağlamak
vîr: akıl /hafıza
hewşî: ağıl
rişî-andın: dökülmek
şu -kirdin: kocaya varmak
fêz: koyunların dinlendirildiği geniş düzlük
şawîn: mutluluk
îşa -andın: acı
hevîr: hamur

Newrozeke bêxwîn

Mem Xelikan

Newroz: despêka biharê, rojek nû ye. Newroz hemû xelkên Rojhilata Navîn, li gor bîr û baweriyên xwe bi adet û kultura xwe pîroz dikin. Kurd jî li gor dîroka wê ya mîtolojîk wek cejna azadî û serhildanê dizanin û pîroz dikin.

Newroz ji pêşerojê re hêvî û ronahî ye. Sembola ji bindestiyê xilasbûnê ye. Dawiya rojên teng astengî, şev û rojên tarî û tava germiya rojê ye. Hûn jî dizanin li Tirkîyê wek her mafekî kurdan pîrozkirina Newrozê jî demeke dirêj qedexa wû. Dema ku kurd ji zilm û zordestiya Dehaqê zalim xilas bûn, ew roja, roja azadiyê, aşitiyê, roja biratî û dostaniyê êlan kirin. Û jî wê û vir de jî li her meheke 21ê adarê Newrozê bi vê fikir û baweriyê pîroz dikin.

Kurdan ji bo azadî û mafên xwe an jî ji bo ku wê cejna xwe pîroz bikin li Tirkîyê pir xebat û bedel dan. Hatîn qurşînkirin, hatin binçavkirin, hepskirin û qetilkirin. Dû van xebat û bedelan ve Tirkîyê Newroz wek cejna xwe qebûl kir û pîroz dikin. Ji bo ku ew jî ne maf û para kurdan be.

Xelkê kurd di dîroka xwe de li her Newrozekê li serê çiyar agir dadidin. Lîbasên xwe yên reng û reng li xwe dikin û bi stran û govendan Newrozê wek roja azadî, aşitî û biratiyê pîroz dikin. Ji agirê Newrozê bi hêvî ne. Bi germiya agirê newrozê bîrinên xwe dikewîne. Newroz li

ser lêvên wana ken e, hêviya jiyanek azad û bi rûmet e.

10-15 sal in Newroz li Tirkîyê bi destûr tê pîrozkirin. Lê Newroza ku jiyanê ronahî bike aşitî û azadiyê bîne bi provakasyonan qilêr dikin. Ma ne mafê me ye? Em Newrozê bi maneya wê ya dîrokî, bi çav bi hêviya aşitiyê, bi biratiyê pîroz bikin. Em nizanin an jî nikarin Newrozê bê xwîn bijîn û derbas kin?

Çend meh in li Tirkîyê şixula pêşvekirina kurdan û demokratîk heye. Daxwaz ew e ku Newroza îsal ji wî şixulî re rê veke. Kenê ser lêvan, nerevîne, dayikan bi girî neke û tu malbatan neşewitîne. 30 sal e, li Tirkîyê xwîn dirije. Ji damezrandina komara T.C. vir de 28 serhildanên kurdan pêk hatine. Ji bo ku kurdan tu caran di bin îdare ya T.C. de rehetî nedîtine. Dem hatiye, ew hatine înkarkirin. Dem hatiye, her mafekî wana qedexa kirine. Kengî wan serî hildane, mefên xwe yên kesayetî, mafên xwe yên însanetî an jî netewî xwastîne, hingê wan bi xwîne bersiv dîtine, hatine binçavkirin, hatine hepskirin û qetilkirin. Pirsgerêkên li ser vê axê tim û tim bi înkarkirinê xwastine çareser bikin.

Lê kurdan li ser axa xwe qet esil û kokê xwe ji bîr nekirine û hetanî huro jî pir xebat û bedel dayîne. Li Tirkîyê bi wîqas astengî û bêrehetiyê ne xelkê tirk ne jî

gelê kurd (û ne yên Çerkez, Laz hwd. jî) li ser vê xweliyê tu rehetî nedîtibin jî, qet di navbera wan de ji hevdu cudabûn û şer çênebûne. Vaya rindî û bedewiyek e.

Hukumata huro ji damezrandina komarê vir de cara yekemîn e ku gotiye, em pirsgirêkên xwe û kêmasiyên demokratîk bi dîalog û li gor hewcetiyan xwe û ji bo hukûka dewletên medenî biguherin û kêmasiyên xwe çareser bikin. Yên ji îdare û rewşa huro rantê digirin, wek mêşên hingiv ku çê dihêlîna wan va bûyî, kirin qîr û bar (CHP, MHP û hwd.) Me dît wek dinê bi ser wan de xelîya. Ji partiyên rast û çep bigirin hetanî yên demokrat û sosyalîst xwe didan nasandin. Giştik li hember vê pêşvekirina pirsgirêkên kurdan û demokratîk derketin. Rastîyek jî ew e ku va gava ku li Tîrkiyê hukumat bavêje, bi herkesekî wek ku ev pêşniyara ji derve de (Amerika) hat, hate dîtin. Ne derew e jî, çimkî tu caran Tîrkiyê ji bo van pirsgirêkan ewqas bi cêmerî hareket nekir.

Lê hundirê pêşvekirinê jî vala wû. Hê jî wala ye. Serokwezîr R.Tayyip Erdoğan her çiqas mixelefet û yên li hember pêşvekirinê, ji bo ku xwe mafdar derxînin wek "ya di bin zimanî te de çi ye? Tu ê çi bikî? eşkere bike, em bizanin. Tu dixwazî Tîrkiyê bi parçe bikî?" gotibin jî, ji bilî TRT-6ê, navên hereman û gundan, navên bajaran yên berê, navên zarokan bi kurdî, enstîtûyên kurd bêtir tu tiştêk negot. Ji pêşvekirinê çi fehm bikinî, dixwaze kîjan mafên kurdan bide û di Anayasaya Tîrkiyê de kîjan maddeyan biguhere, zagona (Yasa) partîyan û ya helbijartinê de çi guherînan bike?, qet aşîkar nekirin. Ji bo

wê jî mixelefet bi heq derxist û hêviyên kurdan vala kirin.

Dema hukumetê dest bi gotina pêşvekirinê kir partîya kurdan DTP jî bi erênî (olumlu) nêzi wana nebû. Wek partiyên Tîrkiyê yên mixelefetê hereket kir. Tu negot em (kurd) û tirk li ser vê xweliyê, li vî welatî em ê weng rehet bikin. Daxwazên me vana ne. Lê tiştêkî weng negotin. Rewşenbîr û xwendevan û nivîskarên kurdan jî tu daxwazên xwe diyar nekirin. An jî kirin kesekî nebihîst. Ya hûn bizanin kurdan jî, daxwazên xwe bi programekê di pêwajoyê de neanîn zîman.

Ne bes e? Hetanî kengî li ser vê xweliyê girî, xwîn, şer berdevam ke? Kêngê, aşitî û biratî ê were cem me. Daxwaza ji dil û can de ew e ku êdî bes e, jîyanek azad û bi rûmet, jîyanek bê xwîn û girî, jîyanek bi biratî mafê me ye jî. Mafê tirk û kurdan e jî. Û mafê her gelekî li ser vê xweliyê ye.

Lê bi min weng xuyaye ku kurd êdî bi partîyeke tu wesayete partiyên veşartî li ser tune bi derê meydana (hola) siyaseteke kevin. Û ew partî û rêvebirên xwe bi îrada xwe ya azad polîtîkê bikin.

Newroz tê. Newrozeke wek di dîrokê de azadî û aşitîyê bîne. Hevîya roj û jîyanek nû ji gelên Rojhilata Navîn re bi hêvi be. Di nêv aşitî û biratîyê de kulên me bi agirê xwe yî dîrokî bikewîne. Daxwaza min e. Bawer im dexwaza herkesekî ye. Newroz ji ber destê nezana kenê li ser lêvên me, bi xwîne nexemilîne. Carek din bi xêr hatî Newroz!

Jêrenot: Pêvajoyê li Tîrkiyê bi lez bi rê dihere. Va nivîsa 02.01.2010ê hatiye nivîsandin.

8ê adarê, roja jinan

Altun Başaran

Sibehê çûm karê tercumanîyê. Tercumaniya min îcar li nexweşxanê bû. Li hundir pîrek rûniştibû. Pîreka kinik û rûken bû. Li min mêz kir, kenîya û got: "Ez qurban, tu kur-mancî? Tu ji ku yî?" Min got: "Erê xaltî, ez kur-mancî im." Got: "Carekê bê li kélaka min rûne." Ez çûm li kélaka wê rûniştim û min li dil û xatirê wê pirsî û got: "Navê te bi xêr?" Got: "Navê min Fat e." Li ser çava xaltiya Fatê, tu çir dikî, rind î? Got: "Ez ne rind im qurban, her deraka min dêşe.

– Çima Xaltî?

– Yarim, yarim... min qe tu xêr nedî. Ez ji daka xwe da ketime pê da dikşînim... got û vê ra jî keser kişand û hêstir ji çavan barîn. Got: keça min, ez cêwî hatim dunyayê. Ez bûm keçik, navê min kirin Fat. Hevalcêwiyê min lawik bû. Lawik li ba me bi qîymet in. Diya min ez nemêjandim. Tenê birayê min mêjand. Xwadê razî nebû bi vi halî. Rojekê birayê min ji hêlekê da gêr bû û mir. Diya min dîsa bi ducanî bû. Wexta ku wê doxim kir, bi serbêrê xwe ve tev çûn rehmetê.

Ez du salî bûme. Ez çûme ketime pêsîra diya xwe, min mêtîye. Ev hewesiya bi min re maye û loma jî ez çûme bi dêv ketime pêsîra daka min a mirî!

Ez li ber destê damariyê mezin bûm. Damariyê ez ê 14 salî bûm, dame mêrekî bi hêwî û bi sêwî!

– Xaltî, çima te mêrekî li salên xwe nekîr?

– Ma min bi xwe kiriye, damariyê ez damê. Wana dî û wana ez damê. Mêrekî ji jina xwe ya siftê lawik nedibûn, loma ez damê.

Min tu xêr nedît, keça min! A niha jî lawikê min ez ji gund derxistim hanîme vira xerîbiyê! Min ne zar e, ne ziman e, bûme kokumek û ketime ber desta! Li vir bûka min pir bi xêr e, jê razî me. Qîmeta min dizane. Xwedê jê razî be!

Lê bûka min a li welêt, sura bêbext e. Ez her havînekê sê çar mehan diçime gund, ê li min suriyê dike, min têsîne. Ezê bi çûyîna xwe pişman tewim. Çûyîni min bi zar û bi livê min re tîne!

Ji bo ku kêfa xaltiyê bê şûnê min got:

– Xaltiya Fatê, îro roja jina ye, 8ê adarê. Li hemû jinên dinyayê û li te pîroz be û bi xêr be!

Xaltiya Fatê:

– Keça min, min ji jinbûna xwe tu xêr nedî ku ez pîroz bikim. Hêrs hat û destê xwe helda bi kotekê afîr xwe û got: Xopanê, tu neyî bi gû yî tu neyî bi mû yî, çima mîna xelkê neyî xêrdî yî!

Doxtir bang Fatê kir, berî ku here;

– Qûsûra min mêz meke, keça min! Min serê te êşand, çi bikim tijî bûme! Bi xatirê te!

Kurdê ku herî zêde ermenî xelas kirine! Muhtila Begê Moksî

Rohat Alakom

Begê began Muhtila Beg

Kurdê ku herî zêde ermenî ji mirinê, ji xezeb û qirê xelas kirine, bi dîtina min begê began, Muhtila Beg e.¹ Di dawîya sedsala 19 û di destpêka sedsala 20an de bi saya Muhtila Begê, bi hezaran ermenî ji mirinê flitîne. Angorî çavkaniyekê Muhtila Begê qasî 4 459 ermenî parastine û ji zilmê xelas kirine.² Ev reqema, reqemeke gelek giring e, em nikarin bidin alîkî. Muhtila Beg di nav mercên gelek dijwar û di rewşeke gelek kirtîk, nazenîn de, bêyî ku cudatiya dîn û neteweyan bike, li dijî daxwaz û emrên hêzên resmî derketiye, hemû telûke û rîsk dane ber çavan, wek em ê li jêr jî bibînin pêşengiya tevger û operasyoneke xelaskirina bi hezaran mirovan kiriye. Ev curetê (cesaret) wî gelek hêjayî nirxandinê ye û di warê xwe de li Kurdistanê mîna yekane ye. Muhtila Beg bi van kirinên xwe, bi kirinên mezin ve em li vir bi rehetî dikarin bêjin ku wek “Kurdê ku herî zêde ermenî xelas kirine” derbasî dîrokê bûye.

Piştî mirinê be jî komên ermenî û kurdan, rêxistinên mafên mirovî divê Muhtila Begê xelat bikin û wî bi bîr bin. Gelek caran kesên wek Muhtila Begê ku bi kirin û gotinên xwe ve ji mirovahiyê re xizmet kirine, bûne mînakên rengîn, piştî mirina xwe di dîrokê de hatine rûmet kirin û xelat kirin. Ji vê şeweyê bîranîna piştî mirinê re gelek caran di zimanên ewrûpî de îfadeya “piştî mirinê” (postum) tê bi kar anîn. Eger wiha nebe dîrok nikare xwe bighîne nîfşên nû û kêrî tiştekî bê. Divê em dîrokê kêrdar bikin. Kêrdarkirina dîrokê yek ji wan mijarên herî giring e ku îro di nav dîrokzanan de tê nîqaşkirin û ji aliyê hêz û komên mirovhez de tê rojanekirin û dibe mijara perwerdeyê. Divê ev begê kurd, begê began, Muhtila Begê Moksî, terfî bike yan jî divê kom û hêzên mafên mirovî terfîya wî bilind bikin û wî bikin abîdeyê mirovheziyê. Çawa em dibînin îro li cîhanê gelek kesên ku wek Muhtila Begê mirov ji talûkan, tengasî, qeza û belayên mezin xelas kirine, wek leheng û

1 Gelek spas ji bo lêkolêrê ji Moksê, Sinan Hakan ku ev nivîsa min bi baldariyê mezin ve xwend û bi hin notên xwe ev teksta hin ji “moksêtir” kir.

2 Jacques Semelin, Claire Andrieu, Sarah Genburger, La résistance aux génocides: de la pluralité des actes de sauvetage, 2008, rûp.211.



Muhtila Beg bi cil û bergên kurdî li Moksê

qehreman hatine dîtinê. Gelo Muhtila Begê ku 4 459 ermenî ji mirinê xelas kirine, ne layiqî vê rûmetê ye û mirov gelo nikare vê rûmetê careke din şunda bide wî? Belê, Muhtila Beg wek xelaskar çawa di çavkaniyên vê nivîsê de jî derbas dibe, xwediye gelek referensên dîrokî ne. Lê belê pir mixabin ku tu tanasib û nîspetek (proportion) di navbera mezinaya kirinên Muhtila Begê û mezinaya qiymetê ku heta niha - angorî kirinên wî - jê re hatiye nîşandayîn tune, divê ev bînîspetî bê guhartin.

Xelaskarê ermeniyên bêgune

Çawa me di destpêka vê nivîsê de jî diyar kir, di salaên 1895 û 1915an de Muhtila Begê angorî lêkoler û dîrokanan qasî 4459 ermenî parastine û ji van herdu komkujiyan xelas kirine. Muhtila Beg, çawa kurdên Serhedê dibêjin, di nav van bîst salan de bûye “mîrovê rojên oxirmê giran”. Wek mînak Orbeli diyar dike ku di sala 1895an de dema hêzên leşkerî yên osmanî avitine ser gundê Vozim (Ozim, Ûzim), Muhtila Begê şênîyê gund ji destê wan xwinxwaran xelas kiriye.³ Dema di sala 1915an de komkujiya li dijî ermenyan dest pê kiriye, bi hezaran ermenî ji aliyê Muhtila Begê de xelas dibin. Gazaryan Garegin ku bi xwe ji Moksê ye, di bîranînên xwe de bi hûralî ser hewldayînen Muhtila Begê disekine. Dema

3 M.S. Lazerev, Pirsax Kurdan, wergervan: Têmûrê Xelil, Weşanaên Roja Nû, 1999, rûp.406.

vê komkujiyê li Moksê dest pê kiriye Gazaryan Garegin deh salî bûye. Muhtila Begê hemû ermeniyên salbuhirî şandine nav mêşe û şkeftan, zarokên ermenî di malên kurdan de weşartine. Gazaryan Garegin dibêje ku wî, xwe li Moksê di mala kurdekî de, di mala “Apê Misto” de weşartiyê.⁴ Karlanê Çaçan di lêkolîna xwe de her wisa jî cîh dide bîranînên hin kesên ku ji Moksê û bajarên derdora Moksê koçberî Sovyetê kirine. Yek ji wan bineciyê bajarê Hîzanê, Nûrî Hîzanî ye ku di bîranînên xwe de Muhtila Begê wiha dide nasandin:

“75 gund di bin destê Murtala Begê de hebûn, çî li wan gundan de biqewimiya, pêra-pêra digihîşte Murtala Begê û badilhewa nîne ku cimaetê digot “Sed çav û sed guhê Murtala Begê hene” û îlahî eger kurdek xatirê ermeniyan keta, ji destê Murtala Begê xelas nedibû”⁵

Muhtila Begê ne tenê bi mafên ermeniyan, karûbarên civakî û bi parastina mafên mirovî ve mijûl bûye, ew her wisa jî bûye parêzgerê heywanan:

“Tiştêkê girîngtirîn heye ku, Muhtila Begê mafê heywanatê jî parastiyê. Tê gotin wextê Muhtila Begê de hin wextê demsalan, keriyên pezkoviyan ji bilindahiya çiyayan berjêr dibûn, dihatin li nik bajêr dadiketin devê Çemê Mezin, ava xwe vedixwarin û cardin berjorê zozanan dibûn. Li ser emrê Mîr, kesekê nedişêya tifengekê lê berde, nêçîrekê bike, ziyaneke bigihîne wan heywanên kovî. Ji ber wê çendê Mîr parêzgerê mafê heywanatê jî bû. Mixabin îro, tu li çiyayê Miksê ji wan heywanan kitekê naşê bibîni, hemû qeliyan û çûn”.⁶

Ji der Orbeli, yek ji wan kesên ku çûye Moksê, li wir Muhtila Beg dîtiye û sûreteki wî kişandiye, rohilatnasê alman Carl Friedrich Lehmann-Haupt e (1861-1934). Ew, di lêkolîneke xwe de di derbarê vî begê kurd de tiştine balkêş dibêje: “Dema li Wanê xebera destpêkirna komkujiyê dighêje wî, ew lez û bez bi 150 rûbleyî hespekî distîne, şev û roj ji ser piştê vî hespî peya nabe, hespê bi halê kuştinê dajo û tê pêşî li vê komkujiyê digre”. Lehmann-Hauptê ku vê kirina Muhtila Begê wek bûyereke mezin û dilşad dide nasîn, paşê gotinên xwe wiha berdewam dike: “Piştî demeke kurt ji me re nesîb bû ku me ev eyloyê (qertel) rûspî di nav kurdan de nas kir”.⁷ Cîgirê balyozê rûs S. Olferev ku li bajarê Wanê dima, bi Muhtila Begê re têkiliyên wî hebûn, gelek caran hev didîtin, wî di derbarê kesayetiyê Muhtila Begê û dostaniya kurd-ermeniyan de wiha gotiye:

⁴ Karlênê Çaçani, rûp.22.

⁵ Karlênê Çaçani, rûp.21.

⁶ Ji nameya Sinan Hakan ya bi terîxa 25/2 2010.

⁷ C. F. Lehmann-Haupt, Armenien. Einst und Jetzt, vol.II, Berlin & Leipzig, 1926, rûp.87.



Muhtila Beg û heyeta birêvebiriye li Moksê

“Murtila Beg merîkî laptên başqe ye. Merîyên nolanî wî yê merîfet, rehm û aqil tune. Wî bi zimanê ermenî gelek baş xeber dida, bi hub û hezkirineke mezin ve berbiri ermeniyan dibe. Wextê di qezaya Wanê de dest bi qirkirina ermeniyan bû, ewî hemû mecal dane sazkirinê bona ermenî ji wê qirkirinê xelas bibin. Di herêma wî de tu ermenîyekî zîyan nekişand”.⁸

Wisa tê xuyan ku mirovhezî di xwîna Muhtila Begê de hebûye. Ji aliyê din wî rastiyek jî dîtiye û dîyar kiriye. Angorî wî eger mirov baş perwerde nebe, ew dikare ji heywanan jî xirabtir bibe, di dawiyê de dikare bibe cenewar. Ez bawer dikim ku mezinahiya Muhtila Begê di nav van gotinên wî yê giring de veşartîye: “Gur li cîhekî mîyekê digre û têr dibe, lê belê mirov bêyî ku hewcedariya wî hebe dikare tevaya cihanê bişewitîne”.⁹ Wî, ev gotin berî sedsalî li ser erdê Moksê ji dostê xwe Orbeli re gotine. Gelek caran xêrnexwazên gelê kurd dibêjin ku kurdan gelek ermenî kuştine, dixwazin bi van gotinên berovajî ve kurdan suçdar nîşan bidin. Lê belê ev hemû çalakî û kirinên Muhtila Begê van dîtinên şaş, derew derdixe. Muhtila Beg çawa di vê nivîsê de jî xuya dibe li dijî vê propagandayê wek abîdeyekê derbasî dîrokê bûye.

8 Karlênê Çaçanî, rûp.23.

9 Orbeli, Folklor i Bit Mokska, Moskva, 1982, rûp.49.

Çend rûpel ji jîyana Muhtila Begê

Muhtila Begê Moksî yek ji wan kesayetiyan kurd e ku hatiye ji bîr kirin. Heta niha di derbarê jîyana Muhtila Begê de xebateke biyografîk yan jî portreyeke fireh nehatiye kirin. Lê belê di hin çavkaniyan ku li Europayê û li Sovyetê weşiyane, bi kurtî be jî qala Muhtila Begê dikin. Ew, ji qezaya bajarê Wanê ya bi navê Moks bûye. Navê Muhtila Begê di hin çavkaniyan de gelek ji hev cihê hatiye nivîsîn, wek Mirtile, Mihtila, Mutialla, Murtulla, Muhtila.¹⁰ Rohilatnasê alman Carl Friedrich Lehmann-Haupt ku Muhtila Beg dîtiye, di noteke xwe de dîyar dike ku Muhtila Begê her wisa jî bi navê “Lutfî Beg” dihate navandin.¹¹ Navê bajarê Moksê jî wek navê Muhtila Begê de gelek caran cuda-cuda hatiye nîşan dayîn (Mog, Mogkh, bi tirkî: Muks, Müküs). Qezaya Moksê ku bi bajarê Wanê ve girêdayî ye navendeke gelek kevn e, di rojavaya başûra Wanê de cîh girtiye. Gelek gerok, lêkoler û kesên mayîn berî sedsalan çûne Moksê. Dîrokzanê kurd Karlanê Çaçan (Karlênê Çaçanî) di xebateke xwe de angorî çavkaniyan rûs û ermenî li ser mijara Muhtila Begê hin zanyarî û agahiyên kêrdar pêşkêş dike:

“Murtila Begê Moksê heft sala li bajarê Stenbolê di dibistana hucirê de xwendiyê û xelas kiriye. Ewî gelek baş zimanê tirkî û farisî zanibû. Di paşwextiyê de ji xwe re dersdarekî digre, hînî xwendin û nivîsara ermenî dibe. Ewî rind haj ji jîyan û edebîyata ewrûpî hebû. Ji sala 1878an heta kutasiya jîyana xwe midirê qezaya Moksê bû û timê hewl dida ku ermenî û kurd bi hevra di nav aşitiyê de bijîn, pizmamiya wan diha û diha mehkem bibe”.¹²

Muhtila Beg kurê Evdal Begê bûye û navê kalkê wî lê kirine. Angorî çavkaniyekê Waliyê bajarê Wanê demekê li dora sala 1912an xwestiyê Muhtila Begê bike qaymeqaymê devere Nordûzê û xelateke osmanî bidin wî. Lê belê wî,

10 Me ev nav di nav vê tekstê de wek Muhtila bi kar anîye, lê belê di jêneqilkirinan de wek xwe hiştiye, neguhartiye. Sinan Hakan di derbarê vê yekê de wiha dibêje: “Rastiya navê wî Muhtila Bege, navê bapîrê wî jî Muhtila Beg bû. Devoka Kurdî “Mihtila” tê gotin. Osmanî/Tirkîya wî Mûtîullah Bey’e. Çi awayê be ez nizanim belê Orbeli bi xeletahî bi “Murtilla” nivîsiye û di nav Ermenîyan û Kurdên Jorîn wisa hatiye gotin, belê neraste”. (Ji nameya Sinan Hakan ya bi terîxa 25/2 2010).

11 C. F. Lehmann-Haupt, *Armenien. Einst und Jetzt*, vol.II, Berlin & Leipzig, 1926, rûp.87.

12 Karlênê Çaçanî, *Pizmamiya Cimeta Ermeniya û Kurda, Êrêvan, 1977, rûp.20-21*. Hin çavkanî dibêjin ku Muhtila Beg di destpêka sedsala bîstan de, hin çavkanî jî dibêjin ku di sala 1902an de bûye midirê qezaya Moksê. Ev yeka û hin nezelalî û valahiyan din ku di biyografiya Muhtila Begê de pêşda tên, divê zêde bîn lêkolandin. Di derbarê mayîna wî ya Stenbolê de Sinan Hakan wiha dibêje: “Muhtila Beg tu caran neçûye Stenbolê û li Stenbol perwerdehî neditiye. Ew gotin xelet e. Lê belê bavê wî Ebdal Beg digel birayên xwe sala 1849’ê li girava Rodosê hatibû sirgûn kirin. Paşê hatibû efû kirin û li Stenbolê Ordûya Hûmayûna Dersaadet Alaya Suwariya Sêyemîn de cih bibû, dora 1860’ê vegehbû li Miksê û li Miks û Kavaşê qaymeqamîrî kiribû. Tirkî zanîn hê ji dewra Xan Mehmûd pê ve rastiyekekê wê malbatê bû”. (Ji nameya Sinan Hakan ya bi terîxa 25/2 2010).

ev pêşneyara qebûl nekiriye û bi kubarî pirsax nexwaşbûna xwe pêşta kişandiye. Muhtila Beg demekê xwestiye dev ji karê resmî berde.¹³

Yek ji wan kesên ku bala me kişandiye ser Muhtila Begê, lêkolêr Sînan Hakan e ku ev çend sal in bi dîroka herêma xwe, bi dîroka Moksê ve mijûl e, çend lêkolînên balkêş bi tirkî û kurdî weşandin.¹⁴ Di pirtûka xwe ya pêşîn de nivîskar bi kurtî be jî li ser kesayetiya Muhtila Begê ya karîzmatîk disekine. Sînan Hakan di cîhekî ve xebata xwe de dibêje ku Muhtila Begê di salên 1920yî de demekê li devera Westan jî qaymeqaymtî kiriye û gelek caran karên xwe li gundê Pşivangê meşandiye. Sînan Hakan di eynî çavkaniyê de her wisa jî dîyar dike ku piştî mirina Muhtila Begê, di nav Malbata Eyubxan Begê de dubendî û dijberiyên mezin peyda bûne, gelek kesên heja jîyana xwe winda kirine. Angorî Sînan Hakan, Muhtila Begê di sala 1922an de vefat kiriye û tucar nezewiciye.¹⁵ Di nav Malbata Eyubxan Begê de Xan Mehmûd û Muhtila Beg du kesên herî karîzmatîk dikarin bîn hesabî.¹⁶ Xan Mehmûd angorî rojnameyê swêdî paşayê osmanî gelek tirsandibû û her çiqas topên paşa hebûne jî wî cesaret nekiriye derkeve derva. Rojname radigihîne ku hemû xerc û xeraca Ermenîstan û Kurdistanê dorberê Wanê ku berê diçû xezîneya paşayê osmanî, niha hemû ev hatina jî vî mîrê kurd ê hêzdar re diçe.¹⁷

Di edebîyata kurdî de îmajê Muhtila Begê

Kesayetiya û camêrtiya Muhtila Begê her wisa jî bala hin nivîskarên kurd kişandiye û Muhtila Beg ji berhemên xwe re kirine mijareke edebî. Nado Maxmûdov di kurteçîrokeke xwe ya bi navê Sîyarê Hespê Boz de qala welatparêzê ermenî Andranik Ozanyan kiriye. Di vê berhema dokumenter de her wisa jî portreke Muhtila Begê ya dîrokî heye. Gundîyekî ermenî ji Moksê ku êdî kal bûye, li vir nîşan dide ku Muhtila Begê gelek ermenî ji zext û zordestiya osmaniyan xelas kirine. Li jêr me beşa pêşîn ya vê serpêhatiyê ji tîpên krîlî guharte tîpên latînî û zimanê serpêhatiyê

13 Karlênê Çaçanî, rûp.23.

14 Sînan Hakan, Mükûs Kürt Mîrleri Tarihi ve Han Mahmud, Weşananên Pêri, 2002. Sînan Hakan, Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürtler ve Direnişleri (1817-1867), Weşananên Doz, 2007. Sînan Hakan, Di dîrokê de Mîks û mîrên Mîksê, Malpera Nefelê (7/4 2009).

15 Sînan Hakan, Mükûs Kürt Mîrleri Tarihi ve Han Mahmud, Weşananên Pêri, 2002, rûp.135.

16 Muhtila Beg neviyê Şêxî Begê ye, Şêxî Beg jî çawa tê zanîn birayê Xan Mehmûd bûye, herdu jî kurên Ebdî Begê ne û neviyên Eyubxan Begê ne. Navê malbata wan (Eyubxan Begê) jî navê bapirê wan tê. Dema Şêxî Beg di sala 1821'ê de tê kuştin, birayê wî Xan Mehmûd dibe Mîrê Moksê. Gelek mirov û neviçirkên ve malbatê niha li Wanê û deverên mayîn dijîn, wek mînak parlamentera kurd Gulşen Orhan ji neviçirka Şêxî Begê û lêkolêr Sînan Hakan jî neviçirkê Xan Mehmûd tînin hesabî.

17 Orienten, Post- och inrikes tidningar, 20/7 1846.

hinekî sade kir ku xwendevan naveroka vê berhemê baştir têbigêhin:

“Wê demê gundiyekî por-gulî spîkirî ku ji Ermenîstana Tirkîyê koçber bibû, ji nav civatê pêşta hat, kumê xwe derxist, hêvî kir ku serleşker destûrê bide du giliyan bêje. Sîyarê Hespê Boz jê re got: “Bêje!

“Ez ji dinya zilmê û qetlê, ji Ermenîstanê hatime, gundî dest pê kir. Ez him şedê tiştên baş im û him jî tiştên xirab. Ez ji qeza welatê Moksê me, di qeza me de him ermenî û him jî kurd hebûn ku ligel hev bi tevayî diman û çî ji destê wan dihat alîkarî didane hevdu. Mîrê kurd yê navdar Murtule Bag serkarî li qeza me dikir. Dibe te navê wî bihistibe. Ew jî mirovekî wek te civathez û heqdar bû. Eger ermeniyên qeza Moksê ji zilmê xelas bûne, bi saya serê Murtule Beg bû. Dema fermana siltan ya veşartî di derbarî komkujiya ermeniyan de hate stendinê, li Wanê dizîka ve civata qaymeqayman, beg û paşan pêk hat. Murtule Beg jî tevî wê dibû. Di civînê de, wê fermanê dixwînin û dispêrine beşdaran ku dema vedigerin cihê xwe, dest bi komkujiya ermeniyan bikin. Murtule Beg şev ji Wanê dertê, digihêje Moksê, gazî serekeşîrên qeza xwe ya kurd dike, wan tîne bal xwe û di derbarê fermana siltan de tiştan dibêje wan. Ew, ji serekekeşîrên xwe dixwaze her tiştî bikin bona muk ji serê ermeniyên qeza Moksêyê kêr nebe. Beşdar hemû ji Murtule Begê re qayîl dibin, xêncî birayê wî yê piçûk, Nureddîn Beg ku alîgirê fermana siltan ya nemirovî bû. Murtule Begê birayê xwe yê qure-qutam girt. Beg ne tenê xweyî li ermeniyên qeza me kir, lê wusa jî gelek malbatên ermeniyan ku ji aliyê Bagêşê, Bitlîs û Wanê revî bûn. Wî ewqas wext ermenî xweyî kirin hetanî ku rûs gîhiştin Bitlîsê. Her tenê paşî vê yekê ew dûr ket, çû, gava hemû ermenî teslîmî rûsan kirin. Ay begê me begekî çiqasî ermenîhez, camêr bû, gundî gotina xwe xelas kir”¹⁸

Nivîskarekî mayîn yê Sovyeta kevn, Eliyê Evdilrehman berî mirina xwe li ser mijara Muhtila Begê kar dikir û dixwest ku li ser jîyan û kesayetiya wî romanekê binivîse. Di hevpeyvîneke ligel wî re, ew wiha dibêje: “Bilî vê, ez niha dîsa li ser romana Murtela Beg dixebitim, çawa tê zanîn ew xweşmêrê navça Muksê bû”¹⁹. Piştî mirina wî, ew destnivîsên wî çawa bûn, em pê nizanin. Eliyê Evdilrehman bi xwe kurdekî ji devera Wanê bû, di sala 1926an de ligel hin kurdên din derbasî aliyê Sovyetê dibin û heta mirinê jîyana xwe li wir derbas dike. Eliyê Evdilrehman wek romannivîsekî kurd tê nasîn, bi navê Gundê Mêrxasa û Şer Çîya de du roman

18 Nado Maxmûdov, Sîyarê Hespê Boz, Riya Teze, 24/2 1990. Angorî Sinan Hakan navê birayê Muhtila Begê yê piçûk, ne Nureddîn e, navê wî yê rast Nûrî Begê bûye.

19 Têmûrê Xelîl, Eliyê Evdilrehman ki ye?, Roja Nû, nr 4/1984.

weşandine. Di romana dawî de ew, Serhildana Agiriyê vedibêje. Muhtila Beg her wisa jî bûye mijara helbestan. Yek ji wan helbestvanên kurd, Fêrikê Êsif wiha dibêje:

*Em gerek hê li Pertev Beg dagerin
Mem û Zîna horî-melek dagerin
Ahmedê wek şems û werşeq dagerin
Li meleyê zimanzîrek dagerin.
Em hê gerek Murtula Beg dagerin,
Bizanîbin çî ye hub, helalî û comerdî...²⁰*

Dema gilî ji dostaniya di navbera kurd û ermenyan de vedibe gelek caran navê Muhtila Begê derbas dibe û ew wek “mîrovê rojên oxirmê giran” tê nasandin.



Rohilatnas û kurdnasê navdar Orbeli, dostê Muhtila Begê

Rasthatineke dîrokî: Muhtila Beg û Orbeli (1911-1912)

Ji der Orbeli, hin kesên din jî di salên kevn de çûne Moksê, wek mînak botanîstê awûsturayî Karl Georg Theodor Kotschy²¹ û rohilatnasê alman C. F. Lehmann-Haupt.²² Yek ji wan kesên ku Muhtila Beg ji nêz ve nas kiriye, di salên 1911-1912an de du caran bi mehan bûye mêvanê Muhtila Begê, dîrokzanê navdar Orbeli ye (1881-1961). Lêkolerekî bi navê K.N. Yuzbaşyan ku li ser jîyana Orbeli yek ji wan bîyografîyên herî fireh nivîsiye, di vê xebata xwe de her wisa cîh dide wê dema ku Orbeli di sala 1911an di mala Muhtila Begê bûye mêvan. Yuzbaşyan di cîhekî vê pirtûka xwe de gotiye ku “Murtulla Begê tesîreke gelekî mezin li ser zanyarê genc

20 Fêrikê Êsif, Berevoka Berhema II, Yêrêvan, 2008, rûp.131.

21 *Botanîstê awûsturayî Karl Georg Theodor Kotschy (1813-1866) di gera xwe ya sala 1859an de çûye Moksê. Li ser vê gera xwe ya duwem nivîseke dirêj nivîsiye û tê de qala Moksê ji dîke. Wê demê birayê Xan Mehmûd, Derwêş Beg serekê Moksê bûye û Theodor Kotschy dibêje ku Xan Mehmûd vê gavê li Ruscukê cezayê xwe dikîşîne. Bênerê: Dr. Theodor Kotschy's neue Reise nach Klein-Asien, Petermanns Geographische Mitteilungen, Volym 6, 1860, rûp. 68-86.*

22 C. F. Lehmann-Haupt, Armenien. Einst und Jetzt, vol.II, Berlin & Leipzig, 1926, rûp.87.

hîşt”. Paşê Yuzbaşyan cîh dide nameyeke ku Orbeli ji Moksê ji malbata xwe re şandiye:

“Ez di mala mudir de dijîm ku begekî kurda ye, ew beg yek ji wan kêman kesan e ku di dema qirkirinê de ermenî parastine. Min degme (kêman) kalmêrekî usayî bedew û xwînşirîn dîtiye. Lê ya sereke ew ku ew gelek maqûl e, ew ji wê demê, ji Wanê wêdetir neçûye. Ew gelek ji min hez dike”.²³

Orbela piştî ku ji Moksê vedigere, di warê pêştaborina kurdnasiyê de gelek karên hêja û kêrdar kirine. Kurdnasan qiymetekî mezin dane Orbela.²⁴ Beşeke mezin a çavkaniyên ku Orbela nivîsîne yan jî li ser wî hatine nivîsîn gelek çarvan qala van hersê mijaran dikin: a) Bajarê Moksê, çand, ziman û folklorê deverê, b) Kesayetiya Muhtila Begê, c) Dostanetiya kurd-ermeniyên. Orbela yek ji wan kesên pêşîn ku cara yekem di derbarê dîrok, civat û zimanê qezaya Moksê de hûr bûye, lêkolîn kirine û çend berhem pêşkêşî lêkoleren kiriye. Pirtûka wî ya pêşîn lêkolîna wî ya bi navê Folklor û Deba Moksê ye.²⁵ Orbela dema di destpêka sedsala bîstan de çûye Moksê, her wisa jî ziman û folklorê kurmancî ya vê deverê bala wî kişandiye û angorî zaniyari û malzemeyê wan salan û angorî dîyalekta Moksê ev ferhenga amade kiriye. Ev xebata wî ya duwem jî bi navê Ferhenga Kurdî û Rusî ye ku di sala 2002an de li Erîvanê hatiye weşandin.²⁶

Çawa em ji dokumentekê fêr dibin Orbela hê di sala 1915an de li ser vê ferhengê karên xwe kûr kiriye û xwestiye vê xebata xwe ji bo çapê amade bike.²⁷ Lê mixabin piştî gelek salan şunda ev ferheng hatiye weşandin. Ji aliyê din ev ferhenga di warê lexicografiyê de ferhenga kurdî a yekem ku angorî devoka herêmekê hatiye amade kirin.



Bergê Ferhenga Kurdî-Rusî ya Orbela ku angorî materyalên dîyalekta Moksê amade kiriye

23 M.S. Lazerev, Pirsra Kurdan, wergervan: Têmurê Xelil, Weşanaên Roja Nû, 1999, rûp.406.

24 Qanadê Kurdo, Akademîk Orbela çawa kurdnas, Riya Teze, 26/7 1970.

25 Orbela, Folklor i Bit Moksâ, Moskva, 1982.

26 I. A. Orbela, Kurdsko-ryssskiy slovar, Êrêvan, 2002.

27 Wezirê Eşo, Dokumêntêdê arxivêye teze derheqa akademîk H. A. Orbela de, Riya Teze, 20/8 1980.

Lêkolera rûs Musaelian di nivîseke xwe da diyar dike ku di arşivan de teksteke Mem û Zin heye ku Orbeli dema li Moksê bûye, bihîstiya û derbasî ser kaxiz kiriye.²⁸

Bi kurtahî ev şemala ku berî sedsalan ji kesayetiya Muhtila Begê dipeke, her wisa jî çawa me li jor dît rûpelekî dîroka kurdî baş dibiriqîne. Moks ji bo Orbeli dibe dibistanekê. Çawa tê xuyan bajarê Moksê tam berî sedsalî (1911) ji rohilatnas, armenolog û kurdnasê naskirî Orbeli re dergê xwe vekiriye, bi mehan kiriye mêvan, hildaye ser seran, ser çavan. Ew û Muhtila Beg dibin du dost û hevalên hev ên herî nêzik. Mayîna Orbeli li Moksê heyraniya wî ya di derbarê çanda kurdî de zêdetir kiriye. Vê yekê li ser vekirina beşa kurdansiyê bandoreke mezin hîştîye. Deme ev beş di sala 1959an de vedibe, Orbeli dibe serekê wê. Ev yeka rûmeta kurdnasiyê li Yekitiya Sovyet gelek bilind dike û Orbeli alîkariyeke mezin dide pêşketina kurdnasiyê.

Ji aliyê din Muhtila Begê ku qiymetekî mezin daye mirovahiyê, bi hezaran ermenî ji komkujiyê xelas kirine, çawa me li jor jî behs kir dostanetiya herdu gelan (kurd-ermenî) kiriye abîdeyêke dîrokî. Navên Orbeli, Muhtila Begê, Moks, kurd û ermenî ev bi salan e her gazî hev dikin, hev bi bîr tînin. Ez bawer dikim ku navê Orbeli wek navê Muhtila Begê piştî salan jî wê di warê nivîsîna dîroka bajarê Moksê de wek du navên hêja û giranbiha bîn bi bîr anîn. Muhtila Begê di salên dawî de ji sîyaset û kirinên dewleta osmanî wisa pir aciz bûye, êdî xwestiya wî welatî bihêle, herî salên xwe yên dawî li Tifîsê li bal dostên xwe yên qedîmî Orbeli û Lalayans derbas bike.²⁹

Muhtila Beg û pîrsa xelasiya kurdan

Muhtila Beg bi pîrsa xelaskirina ermenîyan nemaye, ew her wisa jî bi pêşeroja gelê xwe, bi pêşeroja kurdan ve jî mijûl bûye. Muhtila Beg xelasiya kurdan bi dîplomatê rûs re niqaş kiriye, bi rûsan re ketiya têkiliyan. Muhtila Beg, dîplomatê rûs S. Olferev ku di van salan de li Wanê dima, nas dikir, bi wî re pêwendiyên wî hebûn. Di çavkaniyekê de di derbarê rizgarbûn û azadiya kurdan de raman û baweriya Muhtila Begê jî cîh girtiye. Angorî Muhtila Begê wek hêzeke mezin tenê rûs dikarin li kurdan xweyî derkevin û wan xelas bikin.³⁰ Di van salên dijwar de Muhtila Begê

28 Zhaklina Musaelian, Academician Iosif Orbeli and Kurdisch Classic Litterature, Acta Kurdica, vol.1, 1994, rûp.209.

29 Karlênê Çaçani, rûp.22-24.

30 Karlênê Çaçani, rûp.23.

her wisa jî gelek hewl daye û nehiştiye wekî çete, tûjo û ekstremîstên ermenî zîrarê nedin kurdên bêgune, lê belê dîsa jî di nav wê xirecirê de xwîna gelek kurdan hatiye rijandin.³¹

Muhtila Beg dîrokê dinivîs(in)e!

Navê Muhtila Begê, ne tenê ji bo şênîyê Moksê û kurdan, bi bawerîya min ev nava ji bo hemû mirovahiye rûmet û serbilindîyeke mezin e. Dîroka bajarê Moksê ku gelek caran wek hêlîna ku çivîkên (çûk) Feqiyê Teyran lê daniye û welatê Xan Mehmûd ku serî lê hildaye, tên nasîn, çawa li jorê jî xuya dibe gelek rengîn e. Lê belê jîyana “Kurdê ku herî zêde ermenî xelas kirine” vê dîrokê hin jî rengîntir dike. Ev wargeha hêlînan, vê carê ji ermenîyan re bûye star. Peyvên hêlîn û star ji bo maceraya civîkan, koçberan, neçaran, kurdan, ermenîyan û hemû efrandeyên jîndar ku timê di rê de ne, du peyvên herî watedar û şîrîn dikarin bên hesabî. Mîrov bi dilşahî, bi bextewarî dikare bêje ku Moksê di wê wek hêlîn û stara ku teyran û ermenîyan lê daniye, derbasî dîrokê bûye. Belê, rast e navê Muhtila Beg ji aliyê me kurdan de gelek zû hatiye ji bîr kirin, lê belê çawa em li vir jî dibînin, ew dîrokê dinivîs(in)e!

31 Di derbarê van zordestiyên li dijî kurdan de Sinan Hakan hin mînakên pêşkêş dike: “Li Miksê û li Kavaşê, Taşnaqan gelek Kurdên bêgune qetil kirin. Ji malbata min jî kesê bêsebeb hatî kuştin pirr in. Malxala min ku neviyên Mîr Sêvdînê birayê Xan Mehmûd bûn, li Kavaşê li Gundê Arpêtê bi cih bûbûn. Îro, li Arpêtê goristana komkujiya bi destê Taşnaqan heye ku gelek kesên ji wê malbatê, bêgune, hin jin û zarok tê de radizên. Mihtila Begê ji wan re gazî şandibû ku bi demekê zû werin Miksê, lê belê hin ji wan bi gotinên gundiyan xwe yê Ermenî xapiyan. Ciranên wan yê Ermenî gotin: “Netirsîn! çekê xwe teslîmê me kin, em nahêlin Taşnaq tişteki xirab bînin serê we.” Belê encam wisa nebû. Ew qirkirin bi destê Ermenîyan xwecihî ne, belê bi destê Taşnaqê bûbû. Bapîrê min (Bavê dayika min) Xan Ebdal, dora deh saliya xwe, bûbû şahidê wê qetilama li Arpêtê... Di aliyê din, malbata me (Mala Silêman Begê kurê Xan Mehmûd) dema gaziya Mîr giheştibû mala wan a li gundê Zerikasê, mal hiştibûn û bi lez xwe spartibûn Miksê. Ji yek rojê, mirinê filitibûn. Disa meha Gulanê piştî Kavaş ket, Mihtila Beg û gelê Miksî ji Miksê derketibûn, xwe spartibûn deverên ewledar. Wê navê re kesên ku xwe xelas nekirî ketibûn nav qetilama Taşnaqê. Xwîna kurdan li Miksê jî gelekê rijiyabû. Heta sala din Ermenî vekêşabûn Westan û Wanê, Kavaş û Miks xalî mabû...” Kurteqise; Muhtila Begê, bi salan xelkê ermenî ji zilma kurdên nezan û fermanên mirinê yê dewleta Osmanî parastin, belê bersîva ermenîyan gelekê nexweş, bêrûmet, dilkuj, xirab û tûj bû... Mihtila Beg ev yek heq nekiribû... (Ji nameya Sinan Hakan ya bi terîxa 25/2 2010).

Hevpeyvîn

Brang Şêxbizinî

Min û Şevket Kağitçî le naw Heymane ve nişko le rasti yek hatîn. Ewê je dîyê xeyan je Kusewdelî hatiye ka to-xim wistinî. Wexte ke le nawçe Heymane xape xap rasti yek hatîn le û şuna vîr kirdim ka ra BÎRNEBÛN roportaj vîkarîn. Ewê ji fire şa wî. Min neşîkand.

Merhaba Kakê Şevket

– Merheba

Çu nê baş ê?

– Baş im birewim, kakê min tu çunê birewê?

Spas dikim kakim. Kakê Şevket ka dixwazê werci gi tu winasîn.

– Erê, min Şevket Kağitçî im. Je nawçe Heymane je dîyê Kusewdelî yim. We nawê nuwê Yurtbeylî ya. Le şunî diye nawim Şêxo we. Wê mî dîşin Şêxo. Le salê 1959 hatim we dunya. Min bovikî çor zaruw im.

Kakê Şevket tu çand û gûranîyê şêxbizênî firê rind berdevam dikirê.

Mina î fire xase... Di gi ra man qalî xut nekire? (A ra man qalî xot vîka)

– Wikirim. Belkî kes şexbizênîyal nêzani vu nenasî. Şêxbizênîyal eşretî fire gewran. Le now Kurdê Anatolîa



Nawrast le Serî gi Heymane, Engurî, Polatlî, Kulu, le Sinop Boyabat le Kastamonu Araç, le Samsun Bafra, Vezîrköprü Havza, le Amasya Merzîfon, le Çankiri, Çorum, Duzce, Karabuk Safranbolu, le Akyazi, Erzurum, Erciş, Iğdır, le Amed dêh hezargelo şêxbizênî hestin. Le Kerkûk, Suleymanîye, Erbil (Hewler) hezargalo şêxbizin hestin. Xênce wakurê Irak Şêxbizênîyel gi ra welatî (dîyarî) Heymane dizanin. Heymane jî dizanî ka welatîyan wakure) Iraqe. Je demî cengê Çaldiran hatigin we xarhelat û nêzikî 250 sale ka jî hatiyin ve Anatolîa Nawarast. Çandê îme firê wişê wu dewlemend e. Herkes le welate asîmîle wî, îme hezargel kilometre durî le welata ne ziwane man, ne çande man, ne folklore man je vîr kirdîn. Sew çandeman, sew folklore man î dîyargel gî gerdim. Şune ka nerîm nema.

– *Kake Şêxo çun wîyê we hûnermendî gevre? Diki ji raman qal ewe nêkirê?*

– Min îrem dêwdu dêwsî sal wîm. Ra o çaxe maleman le Heymane wî. Le tavistane diçiyam ve dêye zimistan diçiyam we şêr. Îme le der dêye kustanîgiman hestin min û dapîrim le kustane dimînayn. Wexte ka min dêwdu dêwsî sal wîm yanî nezîkî 1971/1972 îrem ceyran îşnewî. Ra oçaxe, redyonî bîcikim hewî. O redyone jî xas ne rikişay. Ên min û dapîrim diderkeftîn ve seri palgel ka ra xuman gûranî û kilam guhdarî vikirîn. O çaxele Nurî Sesîguzel, Yildiray Çinar îrê meşhur wî. Min jî xew u xeyalem wek ewane hunermend û nawdar wim. Yekî jî ke diçiyam ve naw gewretirgel êke le naw xêyan gûranî divitin, êke şivîngel dikirdin, le govengel gûranîgele ka gûranîçirgel divitine giştê ra min rişig wîn.

Le sale 1982 ye min end le şêr (Engurî) dimînâm. Keftiwîm de karî dewlet. Re layko jî le duya hewesem diçam. Le sale 1984e keftim de îmtahanî û le nav sî sed kes je duya Burhan Çaçan, Kadîr Îpek û Filiz Ökten wim we çorem û le Redyone Ankara kirdinema hunermendî mahalî. Tabî îme gi ve tirkî gûranî dişîn dilim ra zonê xuman di heli lakin bîçare. Re layko karê dewlet dikirim re layko berdewami (devam ve) mûzîk. Le 1988 Bidengizî bantî heweskar pir kirdim ve tirkî. Je gûranîgelî nawê yeki

ji ve zonê xuman xwendim. Gûranîye "*Lamba vêxe ve hêlit de şewî rujî çarat vêmdê*" qise û mûzîk e xum wî. Le 1989e jî bantî dik pir kirdim, ewe nawê "*Henîfe*" wî gişte we zonê xuman wi. Henîfe gûranîyî firê xweş e. Le nawrast Kulu DIPDEDE le ser dilgirtinî hatiye witin. Je ewe duyav sî bant dik we zonê xuman derxistim. Leylo, Tuje kuve vu vijdnsîze.

Ere kakê Şevket Raçe tirkî ne? Ra çê şêxbizîni?

– Ayrême qiseyî Musa ANTER hewi, Musa ANTER witiga ke heyfe kareman ke je axuri xelke dizirî. Karî ka je bindestî wî dil we ferahî xwê bile nêzirî. Qisa qiseyî fire xase. Yekî ka ve zonê xê navit we zonê xê şor nakird, gûranî îwu kilam navit bira qe nawîşî ka min zonim hestin, zonim ciyî ye. Ê îme jî tiştî eça. Ka we zone xot newite ne tam delirê ne tîr divê je guraniyel.

Kakê Şêxo îme dizanîn ka hunermendî zûre, tu çun je binî qayete je binî barê girane ho diderkefê?..

– Kakê Şêxbizîni rat açe wîşim. Le xarhelate çand û edet berdevam divu lakîn le nawçê Anatolia Nawrast hendik zur e, bindesti hestin, zordestî hestin. Tenganîye dewlet hestin. Je nawî tenganiyel îme çun da wikirin. Xuman e xuman je runeman kewrayn. Wextê îme Ozanê gevre Kurt Remzi hevî. Le bane min fire tesire havî. Zaten le


ruyay Kurt Remzi le nawçê Anatolîya ser gişt min u Serulent Kanat hevîn evi kurmancî min va zane şêxbizêynî ruya wokirdîn. Je duya îma fire hunermend hat. Je giştîyan spas dikim. Min le dunya we zone şexbizinî werci gî gurani banti heweskar, banti profesyonel derxistim werci gi je televizyongel zonê şêxbizêynî guranî û kilam witim. Le sale 2007ye le wakurê Irak Le Televizyonê ... Kurdsat derkeftim we bername.

Erê Kakê Şexo karî nu çê dikirê karit hestî ya işniye? Dixazim ka raman wişe?

– Min qesge banti nu widerxim gûranim heste. Gûranîyê dil ê şivin ê govendi. Min bant nederxistim lakîn boş nevistam. Azmayî kirdim. Dê we dê diyar û diyar gerdim. Çiyim we wakûre Irak, çiyim we Boyabat, Havza, Sarayçay, Bafra, Merzîfon, Karabuk fire kar kirdim însallah le î nezika bantî nu a widerxim. Dixazim ka cûwangeliman derkefin je min xastir ruyaman berdevam wikirin.

Kake Şêxo gûranîgelit fire met dikirin. Raman qalî kan gûranî davikirê?

– Gûranîgeli min gişt yek le yek xeştir e. Mesela Hop Leylê, Lamba wêxe We hêlit, Xume xume. Henîfe ê min nîye lakîn fire hate girtin. Eger ka xelkeman baxtîyar kirdiyim min jî fire baxtîyar im.



Ratan dikey Qalî gûranîye Henîfe wikirim. Çanî Henife Raçe îqese hate girtin.

Henife je nawçe Kulu dîyê Dipdede azewike Kazim ji dilê hale Henîfya. Kazim sew ke perê qelin gurdo wikirî diçu ve Hollanda. Si sal we duyav Henîfe dirin ve yekî devlemend. Kazim le Holanda rê ejnewî ka Henîfe dayin we ju teybe diwokirî le ser masa dinuşî vu gûranîye Henîfe dîşî. Nezikî dêh -beyt- le ser Henîfe riwarî we yek û le ser masa dimirî. Gûranîyê Henîfe ê aşiq Kazim e.

HANİFE

Henife wo Henife wo
Hellandêm le erî pa wo
Ra xatırî dot Henife
Pırçe le serım nema wo

Sor im kirdê we uçax e
Rayle nawî zıgım dax e
Resmet derxistım yiristım
Ra dilimke Henê saxe

Qere tiran yar diyar î
Qay vitim Henêm diyar î
Meytuwe ge ram rast kırde
Tesellim xistê yekcarî

Rındê xeweret elgırtım
Ejneftım je xum derkeftım
Îwariye hat we serım
Heta sıwayzi nexeftım

Haremê: KULU, Dıpdede, Kazım

HOP LEYLO

Çum Heymanê hemamê hop leylê leylê leylê
Jı kula ray melhem e hop leylê leylê leylê
Xurtek bi dil zewicî hop leylê leylê leylê
Serxoşe gi sersem e hop leylê leylê leylê
Baxçê leylê pevaz e hop leylê leylê leylê
Pêvaz derkeft weg saz e hop leylê leylê leylê
Ki Leylêy min nênasî hop leylê leylê leylê
Şirîn e gerdengaz e hop leylê leylê leylê

Gul çi ne gul narin e hop leylê leylê leylê
Keftye xewa havinê hop leylê leylê leylê

Kise û muzik: Şevket Kağıtçı
Harem ê Haymana Kusewdeli (du pa)

..LAMBA WÊXE WE HÊLIT DE

Lamba wêxe we hêlit de
Şewî ruj işaret wêmdê
Şuşay serê ge şikiya
Ciremay we serî min de

Malet ale naw gilal e
Dengit dıyay nale nale
Herge dengit diyay wemu
Şaş dikerim rûyê malê

Je nawi kuna diyarê
Esmerê leyaqi yarê
Dikerimge wıvayniment
Gêncu canê le wemirare

Kise û muzik: Şevket Kağıtçı
Harem ê Haymana Kusewdeli

Erê Kake Şêxo spas dikim.

– Min jî spas dikim.
Je Bîrnebun je tu je xelkê kurdan

Yaranî

Ecevit Yildirim

We bi qasî min xwaribû

Li Anatoliya Navîn mixtarên rengîn jî derketine. Yek ji wan jî Miho ye. Miho di zemanê xwe da, ji mezinên gund dihatiye hesibandin. Xudan dil-xatir û cimat bûye.

Rokê li mala Miho, hevalên wî yên weke wî muxtarî kirine kom dibin. Gava Miho radibe ku nimêjê bike, hevalên wî jî îşmar li hev dikin ku wî dengkirin bidin. Yek ji wan dibê: "Lo tê bîra we, wexta muxtariyê me çî pere xwarin, lo!" Î din jî wî erê dike û dibê: "Êrê lawo perê muxtariyê çî yê xweş bûn, lo!"

Miho li ser nimêjê guhdar li dengkirina hevalên xwe dike. Bi lez silava xwe dide û dibê: "Way yawrum way, we bi qasî min xwaribû!"

Li ser xwe yî

Dema xermana, gundiyan li Ewropayê kar dikin bi erebeyên ecer û mezin tene gund. Hesoyê şivan jî dilê xwe dikeve wan. Destê xwe vedike û li ber xudê digere: "Xudêyo, eger ez însanekî rind im, hîngê mîna xelkê tu mal û milkê pir bidî min jî. Eger ez însanekî xerab im, hîngê tu kevira li ser min bibarînî."

Gundiyeke din jî vê berxudêgerîna Heso dibihîze. Kevirekî dike dest xwe û davê li nav çavên Heso dixê. Heso pê mat dibe û careke din berê xwe berve ezman dike û dibê: "Xudêyo, ji rindiyê ra ne lê ji xerabiyê re tu li ser xwe yî!"

Rokê tu bike

Mêrê malê dimire. Jina malê jî qirar dide ku mêr neke. Li ser lawkê xwe rûne û wî mezin bike.

Jina malê li ser soza xwe dadiweste û lawkê xwe mezin dike. Gava zemanê zewaca lêwik tê, bi armanca ku bûkek di malê keve û xizmetê wan bike, lawkê xwe dizewcîne.

Li gor edetan dawetekê dike. Bûka xwe sîyar dike. De tu were, bûka malê ji bo karên rojane ya male, qet di xwe da nalive.

Rokê, jina malê sibê zu radibe taştîyekê hazir dike. Lawik û bûk jî tên li ser nêr rûdinin. Jina malê di guhê lawkê xwe da dibê: "Ku me nanê xwe xwar ez ê rabin şijingê di dest xe kim û dest bi rêşkirina xanî bikim. Hînga tu jî rabe şijingê ji dest min bigre ku ma bûk jî fedî bike û rabe ji dest te bigre".

Wekî ku li hev kiribûn jina malê radibe şijingê dike dest xwe û dibê: "Cikê ez va derna rêş kim û berhev kim.

Lawik jî dibê: "Na etê, tu çima dikî. Ji ber te va ez ê bikim."

Dayik dibê ez bikim, lawik dibê ez bikim. Bûk jî bê ku ji şûna xwe bilive; ê de ji bo şijingekê hîngê mekin!.. Qey royên xudê teva nebûne. Rokê tu rêş ke, rokê jî bila dîya te rêş ke!"

Du parçenivîs bi kurdiya şêxbizinî

Xamgelî Bane

Ev du parçe nivîsên bi kurdiya şêxbizinî û tirkî Xamgelî Bane amadekiriye. Ji bo kesên mereqdar du nimûneyên ji tekstên şêxbizinî ye ku çawa bi lêv dibe. Em ji bo xwendevanên xwe herdu parçeyên van tekstên edebî li gel tirkiya wan diweşînin.

Red.

Je tiştî nêtirsim. Xênce hurdikelî navim. Min ve kan hespo je kan kuyel xericiyayim. Le seri kan kênî, dille kan dot yirtiyim. Pişkojê veri îjliyem le ku durandiyim. Race je navim tiştî germ diherikî vê nêzanim. Wekcar xwum weki bilurî şivan tê rikerim. Wekcar weki parsekerî.

Ke çiqes lay firîyem mêk vu jî, heman are xwumim. Kî vitiye şexbizingel dil nêzanî. Kî vitiye ey durîye. Xwere je piştî neqewe elat ra min. Tiştî ve bidizî je navo min dixwerî. Vervim çerxi kuyê Xecê u Sîyabend kirdim. Guranî diçirîm, fîtik ririmlê. Girdi diyel diyerdim. Xwum mêk kirdiyim, xwum nêvînîm. Ra ve je tiştî nêtirsim xênce hurdikelî navim.

Hiç bir şeyden korkmuyorum. İçimdeki kırıntılardan başka. Hangi atla hangi dağları geçmişim. Hangi çeşmenin başında hangi kıza aşık olmuşum. Gömleğimdeki düğmeyi nerde dikmişim. Neden içimden sıcak bir şey akıyor, bilmiyorum. Bazen kendimi çobanın kavalı sayıyorum. Bazen bir dilenci. Fazla yanımda kadar kaybolsa da, hala kendimdeyim. Kim demiş Şexbizinlar sevmeyi bilmiyor. Bu yalanı kim söylemiş. Güneş tepenin ardından benim için doğdu. Bir şeyler içerden gizliden beni yemekte. Yönümü Siyabend ile Xecê'nin dağına çevirdim. Türkü çağırıp, ıslık çalıyorum. Köylerin etrafını geziyorum. Kendimi kaybetmişim, kendimi bulamıyorum. O yüzden içimdeki kırıntılardan başka bir şeyden korkmuyorum.

Hurdik: kırıntı, ufak

Ku: dağ

Dot: kız

İjliy: gömlek

Durandin: dikiş, dikmek

Pasteker: dilenci

Neqew: tepe

Xwer: güneş

Guranî: türkû, Şarkı

Dê: köy

nışk-o: ani-aniden

xape xap: birdenbire

şıkay-andın: kırmak

birew: iyi olmak

Firê: çok

vişa: geniş

ra-man bize

tavistan: yaz

şêr: şehir

işnewî -işnî: yok/yokluk

pal: tepe

gewretir: büyük/yetişkin

Bidengzi: gizlice/sessizce

heweskar: amatör

Raçe: neden?

şor: sohbet-şiiir

Tenganî: darlık

Kewray-andın: kavrulmak

wokirdin: açmak

met: özel

Vit-in: demek/syölemek

Rêjnewtin: duymak/ haberdar olmak

Kuna: delik/ pencere

Kostane: yayla

La/Le-layko: yan biryandan

(bi kurdiya şêxbizînî)

DILE XWEŞE
Min xwum de bexelu tu voşardiyim
Ve dest merê m, voşarê m
Diqirimim germimo ke
Le der virsiy mayim
Pîxavistim, têniyim
Ve teynam kesîkim îjnî
Je dur nawçê şewî hatiyim
Di qiririm heyî dik germimo ke
Cay le nawi çêwgelim vingir
Min je dur ra tu hatiyim
Hêyî dik xwet lê m vipîç sarde
Nêxwezim nan u aw
Heva tu ale hendimê
Le ban çokit re xwevim ke
Destit le ban sîniyim
Le dile qorî ne vu
Fexmê ke
Virsiy u têniy ra tu keftime rüeyel
Tu rî m
But kirdim
Re bexelit xas voşarê m
Ve dest merê m
Min de dili tu hestim
Le şewê tu şam
Banim vi puşin bira şew vu
Xwere omirin yan jî...

Ferheng (sözlük)
Bexel: koyun, kuçak
Voşardandin: saklamak
Dest: el
Qirimandin: üşümek
Germ: sıcak
Virsiy: aç, acıkmak
Pîxavist: çıplak ayak
Teyna: yalnız
Dur: uzak

Pîçandin: sar-
mak, sarılmak
Sard: soğuk
Hend: yan, yanarında
Çok: diz
Xwew: uyku
Sîniy: göğüs, bağır
Qorî: yasak
Fexm: anlamak, anlam
Ru(ruye): yol, yüz-çehre

(bi tirkî)

AŞK GÜZELDIR
Koynunda saklamışım kendimi
Sakla, ele verme beni
Isıt beni, üşüyorum
Dışarda aç kaldım
Ayaklarım çıplak, susadım
Kimsesiz yalnızım
Gecenin ortasında uzak bir yerden gelmişim
Biraz daha ısıt, üşüyorum,
Gözlerimin içine bir bak
Uzaklardan senin için gelmişim
Soğuk, biraz daha sar kendini bana
Ekmek ve su istemiyorum
Sen yanımdasın artık
Dizlerinin üstünde uyut beni
Elin göğsümün üstünde
Aşka yasak olmaz
Anla
Aç susuz senin için düşmüşüm yollara
Seni gördüm
Kokladım
Koynunda iyice sakla beni
Ele verme beni
Senin gönlünde varım ben
Senin gecende mutluyum
Üstümü kapat gece olsun
Ya da güneşi söndür...

Rîm: görmek
Bu: koku
Hest: var, mevcutluk
Şa: mutlu, mutluluk
Puşandin:
kapatmak, kapamak
Omirandin: söndürmek

Zehakê Marmil

Ahmed Milan

Kurd mezintirîn û kevntirîn miletên aryayî bûnin ku li rojavayê îranê çî li Zozanan¹ û çî li Aran² ar û şûn girtine. Kurdan yekemîn padişahiya Medan yan jî Med li Îranê damezrandinin û gişt gelê Îranê di bin yek çetê da û bi navê Îrana kevn yan jî Bastan xemilandinin û çêkerinin. Wêje û kelîma Îranê tê maneya ji nejadê ariya ku ji dema Medan da hatiye afrandinê û yekemîn car welatê Îrana kevn û antîk jî li ser nexşa cihanê dineqîşînin û baskê destalatiya Îranê dirêj dikin û bi navê Împratûrya Medan tê pesendkirin. Hikûmeta Medan bi destê Kûroş dawî tê ku yekemîn car hikûmeta parsa wî saz kiriye. Kûroş torin û neviyê padişahê Medan bûye. Navê wî Arştî Vayga (Arsiya Vegaz) bûye û Kûroş lawê Mandana ku keça Arştî Vayga bûye. Arştî Vayga pir padişahêkî çavteng û zordar bûye. Arştî Vayga nebûye xudanê ti zarokan. Mandanaya xûşka wî ji jinek din bûye, dike zaroka xwe. Lê di wê demê da keç nedibûn mîrasgirê tac û textê şahenşahiye. Arştî Vayga loma ne dixwast keça xwe bide şahzadekî Medan ku bibe warisê tac û texta wî. Di wê demê da jî Kembûcyeyê³ bavê Kûroş hêşirê dewleta Arştî Vayga bûye. Di wê demê da dîsa hikûmeta Medan pirhêz û zordartirîn hikûmet û dewleta îranê bûye. Niştîmana pars xeracgirê dewleta Medan bûye. Kembûcyeyê di qesra Êkbatanê⁴ da dima û sebeba mayîna wî di qesrê da çonku şahzadeh bûye. Arştî Vayga şevêkî xewnekê dibîne ku darek di zikê Mandanayê da mezin dibe û seransera Îranê digêre lewra pisporên xewnan jî jê ra dibêjin ku ewa dikare zarokê Mandanayê be

1) Zozan li gor mitolojya kevn ew navçên coğrafyayî ku berfگیر û zivistanê pir sar û sert heya rêbandan dibit. havînan ser seviz û hişinayî, têtî mêrg û sosin in loma havînan kurdan keriyên pezên xwe bo çêrandinê dibirin zozanan. Ew mohal û navçên zozanan li ser çiyayan û li bintar û bereka çiyayî qirar girtîye û mînanî: Zincîra çiyayên Zagros û Toros girtî heya nêzî Derya sipî – Kefqaz (nêzî çemê Erez) ra zozan digotin.

2) Aran şûn in ku "keş û hewa" wê germ û nerm, bi wêja îro qışlax jî dibêjin. Di dema Medan da şûna ku bajar lê hebûn jê ra digotin aran. Aran û Zozan li her navça coğrafyayî da hebûn. Bo nimûne: Meda Mazin, Êkbatan (Hemedana îro) ku bajarekî mezin û him jî paytexta Medan bû, di navça Aranê da qirar girtibû. Lêbelê di fêza wê da çiyayên berz ên Zagros qirar girtinin û wan navçan ra zozan digotin. Dîsa bo nimûne: Meda biçûk ku Azebaycana îro girtî heya Azerbaycana Sovyetê, Ermenistan, Gorcistan ku çend bajarên mazin têda hebûn û her bajarekî merkez bi aranî dahat jimartin û heman Aran zozanê wana li serê çiyayî bûn, mînanî: bajarê Tewrêz ku bajarekî kurdî bû û zozanê wê jî çiyayên Sehend û Sebelan girêdayî zincîra çiyayên Zagrosê ye. Gence bajarekî kurdî bû pê ra digotin aran û ji çiyayên Qefqaz ra digotin zozan û bi wî curî mînanî bajarê wan, Yêrevan.

3) Kembûcyeyê ku şahzadeyê parsa bû, lêbelê çend salan hêşirê padişahê Medan bû, bi Mandana prensesa Medan ra dizewûce û Kûroş sêmera zemavendiya wan e.

4) Kaxa Hîgmetanê wê demê da mînanî kaxa Waşîngtona îro bûye. Li paytexta Medan bi navê Êkbatan ku li Meda mezin da qirar girtîye, niha jî bi navê mîras ferhengiya Med li bajarê Hemedanê ye. Hemedan navê wê ye berê Êkbatan bûye. Selçûkî wî bajari îşxal dikin û navê wê digohere û dike Hemedan. "Ji rika kurda va."

ku ew ê li tac û textê te xudan derkeve. Loma Arştî bi şêw ra wezîrê xwe Har Park⁵ hazir dibe ku keça xwe ya bi navê Mandanayê bide Kembûcye. Har Park dibêje; Kembûcye her çibe şahzadê parsa ye û pars jî bîndest û koledarê dewleta Medan e, loma zora wan nagêjin Medan. Li gor biryara pisporên xewna Arştî Vayga û li gor çavtengiya wî ne bi dilê xwe belkî mecbûr dimîne keça xwe Mandanayê bide Kembûcye. Har Park li ser xewna Arştî Vayga tiştêkî ne ji Mandanayê ra û ne jî ji Kembûcye ra nabêje yanî mînanî sirrekî û razekî di dilê xwe da vedişêre. Har Park berê ji Mandanayê re dibêje ku bavê te dixweze te bide Kembûcye û bala xwe dide ku dilê Mandanayê jî di Kembûcye da heye. Loma jê re dibêje roja ku ez û bavê te biçin nêçîrê, hînga tu dikarî bişînî pey Kembûcye û jê ra bêjî. Mandana jî vî karî dike û Kembûcye jî ji şabûnê hindik dimîne ku per û bask derxe. Lewra ew ê him ji hêsîriya çend salan azad bibe û him jî keçek bedew û şahzadeyeka mezin bixwaze ku qet di xewna xwe da jî nedîtîbû û nuha bûye qismetê wî. Loma şaş dimîne û destê xwe bilindî asmanan dike û hevrûyê Xodê dibe; dua dike û dibêje: şokir û spas bi dergahê Xodayê mezin "Ehûramezda"⁶ dikim ku çawa Mandana xiste nesîb û para min û ez ji zîndanê rizgar kirim. Kembûcye nêzî çend salan di qesra padişahê Medan da hêsîr bûbû û bi vê zewacê azadî û serbestiya xwe qazanc dikir. Mandana û Kembûcye bi hev ra zewûcîn û bi hev ra çûn ser axa parsa. Yek sal di ser zemawendiya wan ra derbas dibû ku Mandana bizar dibe. Waxtê raketinê bavê Mandanayê yanî Arştî Vayga dişîne pey keça xwe ji bona ku li mala bavê xwe rakeve, lêbelê ewa jî plan û nexşe bû lewra Mandana haja wê jê tunebû.

Har Park goya şivanek⁷ ji berê da dinasî û haya wî ji kar û kêrdarê şivan hebû, razdar û pak bû loma jê ra dibêje: Wî zarokî bibe mezin bike û bira tu kes nizanibe, ji padişah ra jî ji tirsax xwe dibêje ku min ji şivan ra got wî zarokî bibe bifetîşîne û cinazê wî ji me ra bîne. Wexta ku Mandana tê ser hişê xwe jê ra dibêjin ku te zarokêkî mirî hanîye dinê. Şivan diçe mal û bala xwe didê ku jina wî raketî zarokêkî mirî hanîye dinê û ew jî cinazê zarokê sava li şûna zarokê

5) Har park wazîrê Arştî Vayga padişahê Medan bûye. Har Park wazîreki pir bi tecrube, zana û baş bûye, dema ku hikûmeta Medan dikeve destê Kûroş dîsa Kûroş wî dixwe wazîrê xwe û heya gel jî pir lê razî bûne. Har Park Med bû loma pêwendiyek pir bi hêz û birayane û aşîrperwerane di navbera Pars û Medan da afrandibû.

6) Ehûra Mezda yanê Xodayê mazin û bêhempa, Ehûra yanê Xodayê tavê (xor, xorşîd) li gor felsefa Zerdoşt heke tav tuneba ne jîyan û ne jî mexlûqat hebûn. Med û Pars gişt Xodêperest û ehûrayî bûnin, navê kitaba wan jî "Avesta", navê pêxemberê wan jî Zerdeşt yan Zerdoşt bûye. Paşî hezar salî ku kurd û pars dinê îslamê qebûl dikin, dîsa hineka îslam qebûl nekirin û zerdoştî man. Îro jî li Îranê û Hindîstanê zerdoştî henin. Dinê zerdoştî li gor qanûna esasiya Îranê da dînekî resmî hatî pesendkirin. Dinê zerdoştî dînekî bi prinsîp û Xodanas û pêşrow hatî nasandin û pesandin. Komela wan li dervayî walatî pir aktîv û feal in, heya komela wan li Swêdê jî hene lewra gelek îranî li dervayî walatî jî îslamê vegeryanin ser dinê zerdoştî û heya navê xwe jî kirine zerdoştî yan îranî û piranya wan navê Kawe hîlbijartinin.

7) Çend versiyonên li ser Şivan heye lêbelê ez li gor kitaba "Firiştê Mehmedî" dinvîsim. Şivan mirovekî paqîş û ehûrayî bûye. Hinek rîwayet jî heye ku dibêje, Har Park dizanî ku Şivan karê xirab nake û gava ku zarok dibe û Har Park jê ra gotîye ku wî zarokî bibe here û mezin bike, di wê demê da dibêjin ku haja Har Park jê hebû û jê ra gotîbû ku ew bîne nav lêşkerê Arştî Vayga loma Kûroş Har Park xiste wazîrê xwe û hemû şêwrên xwe jî li "Har Park" dikir.

Mandanayê (Kûroş) dibe qesrê. Hakimên kaxê⁸ jî bala xwe didinê ku rast e û heya Mandana jî yeqîn dike ku wê zarokekî mirî hanîye dinê. Lêbelê dibêjên Har Park li gor pêwendiya wî û şivanê Med dizanî ku lawê Mandanayê zindî ye lewra paşê jî eşkere dibe ku feqet ew û şivan haya wan ji wê razê hebû. Şivanê mednejad mirovekî bi vijdan û baş bûye, ew zaroka mînanî kurê xwe mezin dike û bala xwe didê ku lawekî pir hişyar û zîrek e, gava ku dibe şanzdehsalî jê ra çêroka nasnama wî dibêje. Paşê Kûroş dikeve xizmeta leşkerên Medan û pir jahatî û jîr bûye û dibe serokê leşkerên Medan. Paşê ji Arştî Vayga ra eşkere dibe ku şivan (çend versiyon û teorîyên din jî hene, lê aniha ne hevsela mijara me ye, em tenê bahs bikin ku piştî vê yekê bedbîniya padişah li ser wezîrê wî zêde dibe.) jî wî ra hîle û xiyanet kirîye: lawê Mandanayê nefetisandîye û nuha pê dizanin ku Kûroş lawikê Mandana yê rastî ye. Arştî Vayga fermana serê şivîn dide û dixwaze şivîn bikuje. Loma Kûroş⁹ pê dihise û li dijî kalikê xwe Arştî Vayga şoreşê dike û pê ra cengê dike û kalikê xwe serkut dike û serdema hukmê Medan bi yekcar rûxan dibe. Paşt serkutkirina kalikê xwe dîsa jê ra hurmetê dike û qet heqaretê lê nake. Kalikê xwe ji tac û textê wî mehrûm dike lêbelê qesra wî wêran nake û mînanî berê xemilandî dihêle. Kûroş wezîrê kalikê xwe ku navê wî Har Park bû dixwe wezîrê xwe, Har Park wezîrekî zane bûye loma dike wezîrê xwe û bajarê¹⁰ kalikê xwe jî dike paytexta xwe û sînurê îranê jî berfiretir dike.

Lêbelê mînanî bav pîrê xwe ji gel ra zolmê nake û bacê ji xelqê nastîne û feqet ji serok û padişahên zalimên wan distîne û bi navê padişahêkî edaletperwer tê nasîn loma dibêje ez kurê şivanekî Medan bûm, bavê min şivanekî pir zehmetkêş û xebatkar bû loma jina wî mînanî dayika min emekên baş li min daye, ez baş terbiyet û perwerde kirime lewra tu caran zolm û şeraret hînî min nekirine. Şêx Merdûxê kurdistanî îşare bi terbiyeta Kûroş bi vî awayî dike, Kûroş him terbiyeta Medan û him jî metîniya persa hildaye. Kûroş mînanî hakimekî mirovdost hate pesendkirên û iro "menşûra" wî li ser derwazê "sazmana milel yanî UNê li New Yorkê" pê nûsa wî heye. Niştimanê Yehûdiya ku hêsîr û di bindestên babîliyan da bûnin, bi yardimetiya Kûroşê mezin rizgar bûnin loma Kûroş mînanî milyaketê nacî pesinandînin û heya li gor ayeteke Tewratê ew bi navê mêlyaket pesinandînin

8) Kax yanê qesr û seraya padişahan.

9) Kûroş, şêx Merdûxê kurdistanî di "Diroka Kurdistan"ê da dinivîse ku Kûroş, dayika Kûroş Mandana med bûye, bavê Kûroş Kembûcyê pars bûye loma milekî wî med e û milekî dinê jî pars e. Lewra bi yardimetiya herdu neteweyê îranê îran mazin bû. Merdûx di sala 1970an da li Tehranê dirokvanekî navdar dihat nasîn û xiyabanek li Tehranê bi navê wî nîşane kiribûn.

10) Bajarê Êkbatanê yan jî Hîgmetane ku paytexta Medan bû û iro jî bi navê Hemedan meşhûr e, gişt navçên li ser Êkbatan bi navê Meda mezin pesend bûbûn. Azerbaycana iro jî jê ra digotin Meda biçûk (dema zerdeşt jê ra digotin Atro patkan= agirxane (wemirandîna êgir li gor dinê Zerdoşt bedocaxî û gonehkarî bû, yan jî azer baygan= agirxane û agirxane mînanî merkeza êgir bi roj û şev, meh û sal, salan û çend sed salan veketî diman û ewa jî nimûna giringiya êgir di jiyana insan da dihat hesabkirin. Esera hêza moqedesbûna êgir ji dinê Zerdeşt da heya nuha jî li ferheng û kultura me kurdan da mayî, mînanî: ez sûnd dixum ji alava vî agirî çavên min korke heke derewa dikim.

û dinivîsin ku Kûroş em ji qehr û zolma babîloniyan rizgar kirîye.

Ji dirêjîya dîrokê da gelek qewûmandin li jîyana kal û bavên kurdan rû dane, lêbelê kurdan to caran serê xwe ji dojmin ra xwar nekerîye. Li ser mîratên kal û bavên canê xwe dane lê heya qasî bohîstekî ji ar û axa Kurdistanê derbas nebûne. Êrişin wêranker û wehşî bi miqiyaseke mezin di walatê me da rû daye mînanî: xeznewîyan, selçûkiyan, moxolan û tataran jî heya êrişin ”perçe û beşkirina”¹¹ Kurdistanê mînanî cenga Çaldîranê, şerê kemalîstan, Sedam û Komara Îslamî û heya îro mînanî babîrûskan û pêlên atomê li ax û asmana li ser serên kurd û Kurdistanê da bariyaye, dîsa Kurdistan ji destê dojmin da bernedanin. zîman, ferheng-çand, dîrok û coğrafya kurdî û Kurdistanê parastin û rûmeta Kurdistanê ku yadgar û keda xûna kal û bavên bi her şîvekî xodan derketin. Mînanî ” Kave û Frîdûn dijî zehak û her kurdekî dinin mînanî Rostemê zal li hemberî dojminin kurd û Kurdistanê da tîkoşerê û ceng kirin. Kurd ji hemberî zolm û sitem û qetl û xûnwarî û xûnmêjî ne tenê Zehak belkî hezaran misalên Zehak sekinînin û yê bisekinin. Di dewrana çaldîranê de Kurdistan kirin du beşa û di dewrana modern de kirin çar beşan û dixwestên demografya kurd û Kurdistan ji pê nêrişên faşîstî û qedexeyê kirina zîman û çandên kurdî yan jî bi plan û sîyaseta asîmîlasyonê kurdan bipelîxînin û demografya kurd biguherînin, gotinek pêşyan heye ” *zivîstanê bibohure û rû reşyê komirê ra dimîne û li dojminê rûreşên kurdan ra bimîne*”.

ZEHAK

Zehakê Marmil hakimekî xûnwar û zalim ku bi eslê xwe erebê tazî bûye. Loma gava ku arek û şûnek zêft bikirana ew der wêran dikir û gelên wî dikuşt loma tu kesî cesaret nedikir li hember wî bisekine, ji xêncî kurdan. Zehak demekê bi destê zorê Îran xist bin êriş û zêfta xwe. Kurdan serokîya kesayetiya mirovekî bêgane, xûnwar û zalim mînanî Zehak li ser walatê xwe qebûl nedikirin. Zehak kesayeta wî marsifet û marexlaq bû. Loma heke qebûl yan jî niştîmanek teslîmî fermana wî neba hînga fermana qetla serê wan dida. Fermana serê kurdan da, bi salixa dibêjin ku Zehak biryar daye ku her şevê serê du kurdan jêkin û mujiyê wan ji marê zehak ra çêkin.

Ew mijara kurd û Zehakê Marmil çend zane û nivîskarên bi nav û deng mînanî Şerefxanê Bedlîsî di kitêba *Şerefnamê* da, Ibnê Qetîbe jî di kitêba *El-Mearif*, Mesûdî jî di kitêba *Mervec El-zehab û dîroka Teberî* û Merdûxê Kurdistanî di kitêba ” *Tarîxê Mofeselê Kurd*” (Merdûx dinivîse Zehak 2200 salî pêş zayinî yanî

¹¹ Kurdistan heya berî cenga Çaldîranê (çar dêran) yek perçe bûye û piştî cenga Çaldîranê di 1514-1522ê zayînê da dibe du beşan di navbera dewlata Îranê û Osmanîyan da.

4300 salî berî nuha ew zolma li kurdan kirîye û hinek nivîskarên din jî li ser vê mijarê dût û dirêj nivîsandine û Firdosî¹² di *Şahnama* xwe da li beşa ser Zehak îşare bi mijara kurdan dike û dibêje kurdan Zehakê xûnxwar kuştine û niştimana îranê ji bin zeft û zolma wî nicat dane. Zehak¹³ goya li ser milê wî du mar hebûne û ew marana her şev du muji dixwarin. Zehak fermanê dide aşçiyê xwe ku her şevê serên du mirovan yan jî serên du gencên kurdan jêke û ji marên min ra saz bikî, ji bona ku kurdan serê xwe ji li zolm û sitema wî ra xwar nedikirin. Aşçi mirovekî baş bûye lêbelê ji alîkî ve jî ji Zehak ditirsîyaye, ji wan her du mehkûmên mirî: yek vedîşart û li şûna serê wî, serê pezekî yan jî bizinekê çêdikir û dida marê Zehak. Wî ew xortên kurd bi dizika dişand serê çîyan. Ew camêrên ji mirinê difilêtin li ser hevdu kom dibûn. Gava ku jimara wan gelek bûn bi yardimetiya Kawayê¹⁴ hesinger tevgerê giring saz kirin li dijî Zehakê xûnxwar. Zehak kuştin û li şûna wî padşahêk ji nav xwe hilbijartin û ew bû padîşahê îranê. Ferîdûn ku zilamekî heja û ji malmezînen bû, wê demê Zehak mala wan jî wêran kiribû û bavê wî kuştî bû, wan jî nav xwe Ferîdûn bo padîşahiye hilbijartin. Kawayê hesinger rêberê hilbijartina Ferîdûn û tevgera rizgarî li dijî Zehak bû. Ferîdûn kurê Abtîn ku ew jî ji heman deste û parê bûn hatibûn bijartin bo xwarina marên Zehak. Abtîne bavê Ferîdûn serê wî dibe qîsmetê marên Zehak loma Ferîdûn bi hevkarîya dostên bavê xwe ji çîyayê "demawend"¹⁵ mîna wan kurdên din ji tîrsa Zehak dihatin veşartin û penahen kirin.

Beşek ji helbestên Firdosî li ser kurdan û Zehakê xûnxwar bi zimanê farsî di *Şahnama* Firdosî da heye loma kurdên ku bi wesîla "Aşpez=Aşçi"yê Zehak ji mirinê diflîtine û li çîyan mîna penahberan dijiyan. Bi yardimetiya Kawayê hesinger¹⁶ organîze dibûn.

12 Şayîr û helbesvanê bi nav û meşhûrê Şahnamê ku têda pesnê hemû niştimanê kevn û esilê îranî daye: mînanî kurd û pars û aryaregez ku xodanê mafê ax û walatê îranê bûnin. Li hemberê dojminê ne îranî (xûnxwar û zeftgir û îşxalger) pehlewani û mîrxasê îranî tebar rabûnin û li dijî wan ceng kirin. Mîrxasî û mîrantî ji xwe nişan danin û walatê xwe parastin mînanî Rostemê Zal û Kawayê hesinger û Ferîdûn.

Firdosî dema sultan Mehmûdê xeznewî ku sultanekî pîr zalim û xûnxwar û li dijî niştimanê îranî bû, dibêjin Mehmûd hîjdeh caran êriş bir çû ser Hindistanê û xezîna wan vala kir, derbara xwe zengîn kir lêbelê îraniyan ji birçibûna goştê hevdu dixwarin loma Firdosî û Nasir Xosrow ew Zehakê wê demê dinasin, ew jî rikê wî ji Firdosî dihat û digot çima pesnê me û niştimana turk di Şahnamê da nedaye. Firdosî 1000 sal ber nuha Şahname nivîsandî.

13 Di Şahnamê da bi farsî Zehakê Mardûş dinivîse, dûtş yanî mil. Zehakê mardûş = Zehakê marmil.

14 Kawayê hesinger ku di Şahnamê da û bi farsî Kavêh ahenger meşhûr e û di dîroka kurdî da rêberê rizgarxwazî û li dijî zalîma û xûnmêjan ceng kirîye. Di farsî da "dîrefşê kavyan" yanî ala Kawa û ala azadyê. Îro jî navê sazman û organeke siyasî opozîsyona îranê "dîrefşê kavyan" e.

15 Demawend berzîrtirîn û bilindtirîn çiyayê Îranê û 200-300 mêtirî ji agirî bilindtir e (5700+ mêtir) û girêdayî zincîra çiyayên Elborzê û 100km nêzî Teheranê ye, Elborz bi navê parsan û Zagros bi navê Medan di dîroka bastan da hatiye nivîsandin, Elborz û Zagros jî merkeza û navenda Îranê da digêjin hevdu û hevra gilê dibin mînanî çiyayekî nîmêz.

16 Ahenger bi parsî ya kevn

Farsi:

*Ez îngûneh her mahyan sî cevan
ez îşan hemî yaftendî revan*

*Çun gêrd amedendî ez îşan divîst
ber Ansan kê neşnextendî kê kîst*

*Xorişger ber îşan bozî çend û mîş
bidadî û sehra nehadiyeş pîş*

*Knûn kurd ez an toxmêh dared nejad
Kez abad ber dil neyayedêş yad*

*Boved xanehêşan seraser pelas
Nedarend der dil ez yezdan heras*

Wergera kurdî:

Bi vî avayî her mehê sî cevan
ji wana peyda dibûn ruh û revan

Çun jimara wan dibûn dused
eşkere nedibûn nasnama wana çiqes

Aşçî şûna li wan ji pez û gîskan
dida vedişartin û paşê bi dizî direviyan

Nuha kurd ji wî toximî nin nijad
ewana avakirin nayê bîra tu kesan

Malê wana heke ji cil û palasa be
natirsin ewana heta ku yezdan be

Firdosî dema ku *Şahnama* xwe dinivîse, Îran hînga bin zeft û zexta Sultan Mehmûdê Xeznevî¹⁷ da bû û Sultan Mehmûd jî mînanî Zehak xûnxwar bû ew jî mîna Zehak ne îranî bû loma bi eškere li dijî gelên Îranê xebat dikir û nijadperest bêperva bû, desthilat û xebatkarên û leşkerên wî gişt turk bûn. Hîjdeh caran bi navê dewleta Îranê êriş birin ser Hindistanê, xizne û malê wan bi carekî zeft û xaret kiribûn, li aliyê din jî mîletê Îranê (kurd û pars) xistibû bin zext û êrişa maliyatek bêbinî loma gel gihîştibûn merzê birçîbûnê û heya xelayê, wesa xela îcad kiribû ku heya nan û goşt tunebû. Loma li ber birçîbûnê zarok didizîn û heya goştê zarokan dixwarin û hînga xizna sultan zengîn bû û ne ji bona gelê kurd û pars bû belkî ji bona leşkerê xwe û xezneviyan bûn. Li gor zulma Sultan Mehmûd gelek helbest nivîsandine, yek nimûne mînanî:

ew xûnxwarên bêxanî û mal

hatin welatên me bûne xan û xatûn

Tevgera siyâsî ya wê demê da ku rengê nasyonalistiya îranî tê da pir bi hêz bû bo xatirê hebûna nivîskar û zane û ronakbîrên mezin mînanî Firdosî, "Nasir Xosrow¹⁸" Xeyam bûn, wan li dijî zolm û sîtema dîktatorê zulmîkar fealiyet

17) Sultan Mehmûd lawê Seboktekîne Xeznewiyê ku turk bûnin û xolamê derbara samaniyan li Îranê da bû. Padişah ra xiyaretê dîke û ji xolamtiyê digêje padişahyê û zolma wana mînanî Zehak digêje ber perê asman. Loma Firdosî pesnê kurd û parsan dide ku du niştîmanin kevn û orginalê îranê bûnin. Firdosî turkan ne îranî û sultanê wana jî rasîst dinase, loma Sultan Mehmûd di dema xwe da *Şabanamê* bêrûmet dîke û Firdosî jî pir dêşîne.

18) Nasir Xosrow nivîskar û şaêr dema di xeznewiya da çend pirtûk û helbest li dijî xeznewiya û heya turka nivîsandî û pir ji aktiv siyâsî li dijî wana xebat kirîye û heya mezhebê îsmayîliye mînanî tevgera welatparêz li dijî turka qebûl kirîye û di pirtûka "*Şefername*" yê da bi dîr û dirêj li ser bêrehmî û şovînistiya turka nivîsandîye.

dikirin û dinivîsandin. Di wê demê da dewlet û sînorê nasyonalîstî tunebûn lewra mixalifeta xwe bi navê "mezhebê îsmayîlî" saz dikirin loma gelek zane û ronakbîrên îranî bûn endamê vê tevgerê.

KÎ NE KURD?

Rojên reş di dîroka kurdan de tim û tim hebûye û bi dîtina min belkî Zehak mar li ser milê¹⁹ wî tunebûye û belkî jî mînanî çîrokên dêw û periyan digotin hebûye, mîna "Dêwan". Dêw ji însanên bedsîret, xûnxwar, qatîl û mirovxwar ra digotin û li hember wî jî "perî" insanên baş, paqîş, adil, dilovan û demkorat ra digotin. Loma heke Zehak mar li ser milan nebûye lê bê şik dêw bûye: kurdkuj û kurdxwar bûye. Şah Îsmayîlê ecem li dewra 1500ê zayîne lawê Emîr Begê²⁰ Lepzêrîn hêsîr digirên goştê wî dixwin. Loma mirovên dêwexlaq mînanî Zehak di qeder û jiyana siyasiya kurdan da pir û pir bûne. Gelek nimûnê ji wan hene mînanî di cenga "Çaldiranê" da fermana serên kurdan didan heke piştgirî li sîyaseta wan nekira, ew kurdên ku ji wan ra alîkar dikirin jî, di şerê wan da dahatin kuştin. Lewra Kurdistan bû du beş, beşa ser osmaniyan û beşa aliyê Şah Îsmayîlê Sefevî ku ew jî turk bû û bi yardimetiya kurdan ji şexiyê gihîşt padişahiya Îranê, loma di cenga Çaldiranê da feqet kurd hatin kuştin û him bi navê osmaniyan û him jî bi navê îraniyan, li gor dîrokê Şah Îsmayîlê Sefevî di cenga Çaldiranê da şikestê dixwe û di wê cengê da Şah Îsmayîl tenê ji mirinê difilite û ew jî canê xwe deyndarê serdarekî kurd bûye ku bi navê "Bîro Bare". Di wan deman da çend ceng û êrişên ku dibin, gişt li Kurdistanê diqewûmin, heya çend cengên ku di navbera ûris û osmaniyan da jî li coxrafya Kurdistan da diqewûme û ji %40 kurd di wan cengan da tîn kuştinê, yan jî dibin qurbanîyên birçîbûn û xelayan. Heya dewrana modern jî kurd û Kurdistan dibe meydana êriş û îşxala dîktator û rêberên nekurd: mîna Mistefa Kemal, Riza Xan, Stalîn, Sedam Husên... ewana jî her yek bi xwe qasî Zehak jîyana gelê kurd zolm û sitem reva kirine ku fermana serê kurdan didan, gund û arê wan disûtandin.

Zehak li dîroka kurd da 4000 sal diqewûme û eva çîrok jî nîne ku em kurd vê çîrokê ji xwe derxin û yan jî saz bikin. Lema em ji qewlên dîrokzanên biyanî dinivîsin.

Helbesta pîroziya kurd li hemberî Zehak bi destê şairê mezin î Îranê Firdosî li pirtûka *Şahmameyê* da tê xemilandin. Xelata vê pîroziyê û zefere jî cejna Newrozê ye.

19) Şerefxanê Bedlîsî di Şerefnamê da dinivîse ku li ser milê Zehak du birinê mînanî mara derketibû û roj bi roj devfire û mazin dibûn û loqmana û hekîman teşxis didan ku eva seretan (Kenser e) û Zehak ew hekîmîna kuşt, hinek hekîman bi tîrsa canê xwe gotin ev marên li ser milê te gerek her roj mujyê gencan bixwin û pê jiyana te û xwe devam bike.

20) Emîr begê lepzêrîn li mîrê kela dimdim (Nêzî urmyê) 5 salan bi Şah Îsmayîl ra cengê dike û Şah Îsmayîl pê nikare û lawê wî 12 salî zindî dixwe nav sîtila kelê û dikelîne, him xwe û him jî serok leşkerên wî goştê lawên mîrê kela Dimdim ê dixwin. Goştê dojmanan xwarên di ferhenga turkan da hebûye .

NEWROZ

Newroz cejna rizgariya kurd û pars û îrana bastan ji destê Zehakê xûnxwar e. Merdûx dîrokvanê mezinê kurd dinivîse ku kurdan di 31ê agustosê²¹ da Zehak kuştine û ev cenga 4200 salî berî nuha rû daye. Rizgariya gel ji destê Zehak, di meha mêhr yan jî mêhrganê da bûye loma navê wê termê mêhrgan yan mêhrcan bûye mêhr²² yan felek canê wan zindî kirîye û ew cejna heya îro jî di Îranê da berdewam e, di wan deman da cejna mêhrganê çandina daran, yanî sembola zindî kirina candaran li çarçûba jîyana însan û beşeriyetê ye. Pêwend û hevdu pijêrandina unsirên pêwîst bo hebûn û xebata însanan e.

Bihar demsala hêşînbûna nebat û tecdîda jîyanê ye, lewra di biharê da siruşt reng, kin û bergên xwe diguhezin, deşt û demen, mêrg û zevî, çîya û banî bi gul û sosinên rengareng dixemilin. Candar mînanî çûçikan û balînda hêlînên xwe ava dikin û niştimana me jî ku ji destê jenosîda Zehak filitîne, di destpêka biharê de Newrozê cejn digirin û çend hezar sal in ku ew cejna bastan berdewam bûye. Loma heya îro jî em kurd ji rewşa zolma Zehak û kesayetên mînanî Zehak rizgar nebûnin, lewra Newroz dûmkariya jîyana mêhrganê ye. Em kurd, fars, tacîk, efxanî, azerî, belûç li seranserê cihanê roja destpêka biharê²³ cejnê digirin û îro jî mînanî tevgera netewayî em Newrozê dinirxînin. Lema rola Newrozê li ferheng û komela kurdî da pir giring û hêja ye. Li gor hinek astengan bi taybetî li Tirkîyê mînanî nebûna azadiyê cejna Newrozê bûye tevgerê sîyasî û ramanî.

Newroz û cejna Newrozê bîngehek dîrokî ya sîyasî, azadî û rizgariya jîyanê û hebûn û felsefa hebûnê ye(existence). Loma di nefsa cejnê de jî peyamên: perwerdeya hevjiyanî, hevpeymanî, hevgirtin, aşî û biratiyê heye.

Di Newrozê da çîng cejnê digirin?

Bi sê merhela û sê caran Newrozê pîroz dikin:

- 1- **Çarşemiya sor:** Êvara roja sêşemê yan jî şeva çarşema dawîya salê cejna yekem dest pê dike, bi agirdadanê şadiya hatina Newrozê û sipasiyê bi sala buhurî ra dikin.
- 2- **Sofrêka Newrozê sofrêka rengîn e.** Bi heft tiştên simbolîk ku her heft jî pê herfên "S" dest pê dikin û sofrêka giştî mînanî hevdu dibin.
- 3- **13ê gulanê** "Ehmedê Xanî di pirtûka xwe da li ser vê resmê nivîsandî" roja ku cejna Newrozê bi sala nû da dawî tê û di wê rojê da her malbat diçin deşt û demenan bo gerê û pîknîkê, şên û şahiyê dikin.

21 Bi kurdî dibe meha xermana yan jî cutkaran.

22 Mêhr navê meheke bi zimanê Avesta ye, em îro jî jê ra meha xermana dibêjin

23 Roja Newrozê yan gulanê beramberî 21 adara (march, mars) zayinî ye, di vê rojê da dirêjîya şev û rojê bi qasî hev e.

"Çarşemiya Sor"²⁴ nexş û rola agire, li gor jimara îro hefta 52an e yanî hefta dawiya sala kevn yan jî êvara çarşemiya axiriya salê ye. Gel di vê êvarê da li ber malên xwe yan jî li ser xaniyan agirê Newrozê dadidin. Agirê Newrozê bi du şîwa ye. Yan heft koçkên êgir dadidin û paşê hemû endamên malê di ser agir ra banz didin û dibêjin, soriya te ji me ra, zerya canê (nexwaşî û êşa can û revan) me ji te ra. Yan jî agirekî tenê dadidin û heft caran di ser êgir ra banz didin. Soriya êgir: yanî germî, saxî û rengê şahiyê û şadiyê ye. Heft: jimara heft jî di ayînên me yê kevn da ededê moqedes e. Paşê jî zarok û genc topên agirkirî saz dikin û davêjin hewa. Îro jî bi listkên barûtî û modern li Çarşema Sor cejnê digirin û heya derengî şevan jî dûm dikin.

CEJNA ROJA NEWROZÊ!

Resm û seremoniya cejna Newrozê di roja yekemîn a biharê de dest pê dike, di vê rojê de bi dîtî û zîyaretkirina hevdu, Newroza hev pîroz dikin. Biryar û peyama Newrozê yanî dostanî, aşitî, biratî, mirovhezî ye. Di vê rojê da dukan û bazar, medrese, îdare û her şûn girêdayî ye û mînanî cejna krîsmesê heftekî tatîl e, medrese û zanko jî 13 rojan tatîl dibin.

Dîdar û dîtî heya 13 rojan rû dide û heya 13 rojan her kes li derva hevdu dibînin, çî nas û çî nenas! Destê hevdu digivêşin û ji hevdu ra tebrîka Newrozê dibêjin. Zarok(biçûk) diçin zîyaret û dest ramûsandîna mezinan û xelata Newrozê ji mezinan distînin. Xelata Newrozê li gor resma modern mînanî cejna krîsmes bûye lêbelam berê ev resma tu nebûye.

Nexwaş: Ziyareta nexwaşan di vê roja ezîz da bi sokura her kesî da deyne, tebrîka Newrozê dibêjin û pêra saxiyê û şefayê ji Xodê dixwazin.

Newroza "reş": yanê ew kesên ku miriyê wan di sala pêşîn da vafat kirîye yan jî "*reş girtinî*" loma cînar û nasên wan diçin serdana wan, him serxwaşiyê dibêjin û him jî Newroza wan pîroz dikin.

Keyd û dilêş: dujmintî û kîn gerek di vê roja giranbaha da were jibîrkin û dilê hevdu bikin bi çûyîna malên hevdu, heke lihevhatina wan têkeve asteng û tengasyê hînga pêvîst e ku berpirsiyariya rûsipîyan û porsipîyan rola kal û bavan bilîze û bi şîretên xwe dujmintiyê di navbera wan da derxînin û wan bi hev bînin, lewra bingehek Newrozê ya mezin aşitî û dostanî ye.

Sala te pîroz be! Bi name û tîlan: Peyama Newrozê! Heke ziyareta Newrozê bo xatirê rêya dûr û yan sebebek jîyanî mumkin nebe bi pênivîs yan kartên tebrîkan pîroz dikin.

24 Çarşemiya sor ew çarşemiya dawiya salê ye û agir dadidin û di ser agir ra bazdidin, cejnê digirên. Agir (avir, ar, atro, adar, azer...) Agir jî dîne Zerdeşt da moqedes bûye. Felsefa wî yanê bê agir jîyan nameşe. Loma hebûna agir pîr girîng e. Êmtiyaza agir ên di jî ev e: Agir her tiştekî disûtîne û paşê jî dîsa bi xwe pak û paqîş dimîne.

SOFRÊKA RENGÎN YAN MASA NEWROZÊ

"Sofrêka Newrozê"²⁵: Serê salê sofrêkek rengîn di malan da radixînin û bi heft tiştan dixemilînin²⁶, "heft" li Îrana kevn û di ayîna Zerdoşt da jimarek moqedes bûye, loma heft rojên heftê yan heft caran li ser agirê²⁷ Çarşemiya sor ra banz didin. Heft tiştên têda jî sembol û nîşana berdewamiya jîyanê ye, mînanî: **sîr, sêv, sincik, sîrke, semenî, sewze, sîm** e ku her yek sembola berdewamiya jîyanê ye. Her heft jî bi herfa s=sîn dest pê dîke loma pêra dibêjin masa û sofrêka **Heft Sîn**, lewra di her malê da jî heye. Heft Sîn resma çend hezar salan e û di malên çî zengîn û çî feqîr û kasib da, mînanî:

1- **Sîr** sembola dûrî ji nexwaşiyê ye.

2- **Sêv** sembola saxî û silametiye ye.

3- **Sincik** sembola parastin û sebir û tehemola jîyanê ye.

4- **Semenî** sembola şîrîniya jîyanê ye.

5- **Sirke** sembola temen û emrê jîyanê ye.

6- **Sewze**²⁸ sembola bereketa ziraet, kişt û kar, çandin û hasilata sala nû ye. Sewze di 20 rojan da hêşin dibe û mizgîniya biharek xweş û sersewz dide. Sewze bi gênim saz dikin û genim di aboriya wê demê da rolek navendî listiye. Loma bi gotinek dinê jî "**genim yan nan**" yanî ceng li dijî birçîbûnê bû. Lewra ev sembola nefsa hebûna jîyanê bûye. Li ser hebûna nanê li jîyanê di wê demê da helbestek gotinin: "**ewr û ba, meh û xor**"²⁹ û felek digerin û xebatê dikin heya tu nanekî bi dest bînî û di xefletê da nexwî" nebûna nan di wê demê da nîşana xelayê û birçîbûnê bûye.

7- **Sîm**: zîv, sembola pêştaçûyîna aborî û maldariyê ye loma perên hesin yan zîv ku dixin piyalekî û datinîn ser sofrêka "Heft Sînê" û di vê terz wêne û risûmatê da şûna "sîm=zîv" jî dezgaha heft sîn da cî digire.

13Ê NEWROZÊ

Sêzde bêder

Roja 13ê meha Newrozê yan jî di gulanê da gişt gel malên xwe terk didin diçin seyranê yanî mêrg û zevî, bax û baxat, deşt û demen û bereka çîyan û gelî û newalan ku cejna sêzdê Newrozê bi xêr û xweşî, bi şahî û govendan pîroz dikin. Ji 13 rojên Newrozê roja dawîn bi vî awayî pîroz dibe. Ehmedê Xanî ji di Mem û Zînê de bahsa cejna sêzdê Newrozê dîke.

25 Sofrêka newrozê yan îro bi ser masan bi heft tiştên rengareng dixemilînin ku ew heft tişt pê herfên "S" dest pê dîke.

26 Di pêşiya da dibêjin sofrêka rengîn yanê sofrêka Newrozê

27 Heft koçikên êgir di çarşemiya sor da saz dikin û li ser her hefta ra jî carekî banz didin.

28 Sewze sê hefta berî serê salê genim di nav avê da radixînin û piştî çend roja avê hirdişînin û wî genimî dixin nav peçeyên qomaşekî û didin ber tavê heya binî digire û dixin nav ferakî û heya destpêka Newrozê qasî 20 santimî blind dibe û dibe xemla sofrêka Newrozê ê

29 Xor yanî tav û ror.

BI DİZIKÎ

Hezkirin û Dilketin

Nuh Ateş

*"Siwe da rawûm çik eyaz e
Navê rindê Gulbeyaz e
Bi dizikî go, eşkere nekir
Ma ew zalima nebihîze" (x)*

"Bi dizikî go, eşkere nekir" di kilameke Xelikana Jor (Karacadag-Kulu) da wer hatiye gotin. Ji hev hezkirin û dilketin hetanî sî û çel salî di ber vê li gundên kurdan yên li deşta Anatolîyê bi diziki bû. Dilketîyan ji dûredûr va ji hevûdu hez dikirin. Ew bi hesreta hevdîtînekê dihêlîyan û li ser hevûdu distran. Pir caran ji tirsra ra di stranên xwe da navê hevûdu yê rast helnedidan. Carnan jî neçar diman, sewa ku bigêhêjin mirazê xwe bi hev ra direvîyan û serê xwe dikirin beleyan. Keç û lawan berve bavê ji kurikên xwe heznedikirin. Bukên teze berve xasî û xezurê xwe nan ne dixwarin û bi nav bange mêrê xwe nedikirin. Kesên bi dergîst hevûdu bi dizikî didîtîn. Wan xwe ji ber xasî û xezuran vedişartin. Dirêj nekim, ji ku derê da lê mêz bikî kultureke neyar bi hukim bû û tê da hezkirin û dilketin mehkumê bidizikîyê bûn.

Hevalekî min bi dergîstî bû. Şevkê xwast ku here dergîsta xwe bibîne. Edet bû, kesê ku here serdana dergîsta xwe hevalekî xwe bi xwe ra dibir. Hevalê min xwast ku ez pê ra herim. Li gorê edetê tenê xasîyê dizanî ku zaveyê malê ware dergîsta xwe bibîne.

Zivistan bû û berf digihêjte çokên merivan. Ku tarî rind kete erdê me da rê û çûn mala dergîsta hevalê min. Çiqineke tijî şekir û fistic û lokim û biskewît di destê hevalê min da bû. Em bi dizikî diçûn. Bi rê da ku kesek raste me dihat me cîlê xwe diavête kendalekî û vedişart. Te yê bigota em ê diherine dizîyê. Em gihêştin perê malê dergîstê. Li wê derê çaleke (bîreke) gênim ê betal hewû lê me hay jê nebû. Çal heta dêv tijî berf bûbû, lewma me ew ferq nekir. Em herdu jî xûşîn û ketin çalê û di bin berfê va bûn. Sêr ji me derket. Hevalê min bi gura min nekir û nexwast ku em ve-

gerin. Me li derîyê mala dergîsta hevalê min xist û kewaniya malê derî li ber me vekir. Gava ku wê em dîtin bi halê me yê mîna mişkê nav avê kenê xwe zept nekir.

Serhatîyên bi ken û komîk yên li ser çûyina serdana dergîstan pir in. Qala yekî dikirin, ew çûyê ku dergîsta xwe ya li gundekî cîran bibîne. Wê şevê li mala dergîstê bûye mîvan. Bi nivê şevê ra bûye ser xwe û xwaztiye ku bi dizikî here dikeve cem dergîsta xwe. Bi şaşî çûyê odeya xêzurê xwe. Xezûr di nav nivînan da raketîye. Zavayê malê di şevêşê da xwe bi rû xezûr da berdaye. Xezûr bi xwe hêsiye û ji ba wî jî ku jina wî hatiye cem wî. Xwe çerx kiriye û dest avêtîye derên wî yên mehrem û pê ra wêrinî bi ser ketîye. Zavayê malê bûye rûs-wa. Xezur lê heta dêv hatiye û tu jê ra nehîştine. Nişana wi şûn da vegerandiye. Mezin û heşgihêştîyên hîngê ketine navberê û herdu hêl bi zorê lihevanîne.

Lê niha bandora qeyd û bendên kevneşopîyê li ser hezkirin û dilketinê kêr bûye û şikestîye. Jîyan di şûna xwe

da daneweste, pêvajoyeke dînamîk e. Ew her gav xwe nû dike û diguhêre. Li Gundên kurdan yên li nava Aanatolîyayê jî weng e. Dûzan û tevgera eşîrtîyê zu va ye ku helweşîye. Karên wekî cotkarî, rencberî, şivanî û pezxwedîkirin neman û nifşên nû wan nasnakîn. Bi tîn û tam û bi rindî û xerawîyên xwe va bayê globalîzm û modernîzmê li wan deran jî qelîfî. Va bû çel û pence sal gundîyên kurd ji Anatolîyayê jî bar dikin serbajerên Tirkîye û welatên Ewropayê. Pêşvaçûna hacetên teknîk yên ragehandinê, di bergîştkan jî destelefun û înternetê derbeyek giran li kultura bidizîtîyê xist. Di sayê wan da dan û standin, hevûdu naskirin û ji hevûdu ra peyam şandin hêsan e. Ji avrûyên van faktorên da jîyana kurdên Anatolîyê hate guhêrîn û di ser û bin hev ra bû. Di sîya van qewimî û guhêrîyan da hezkirin û dilketin li gorê ya berê serbest û aşkere ye.

06.01.2010

(x) *Berewkar Mem Xelikan, kovara*

Bîrnebûn, hejmar 14, rûpel 16



Wêne

Seyfi Dogan

Huco di daweteka gund de, ji malpera Karacaxê hatiye wergirtin

Di vî wêneyî da, detaya ku baş xuya dike, Huco û zurna wî ye. Wêne kîjan salê hatîyê kişandin? Wênekêş kî yê? Dohilê kê yê? Kîjan demsal e? Ezî bersivên van pirsana nizanime. Min ev wêne, di malpara karacadagê, malpara Îbrahim Yildirim da dît.

Wiçendî ku xuya dike, wêne yî li payîzê resimendine. Çimkî dema ku Hoco aktiv li zurnê texist, hema hema dawetên pir, bi du xermanan re dibûn. Ew jî dekeve meha îlonê an jî destpêka çirîya pêşîn. Li wêne dinêrî ortalexî zer e û kincên insanan kincên hevînê ne. Loma jî dibe ku meha îlonê ba.

Xonta hîng nebûne mode. Dêmeke wêne yî li navîne 1960 hatîyê kişandin. Çimkî xonta ji navîne 1960 bi şunda di nav keçik û bûkan da bû mode lê jinan

hîn wê wextê sewawî û berfang li xwe dikirin. Wê demê keç û xortan gowend tevhevdu dikşandin. Xort li aliyê serî û keç di dawiyê da bûn.

Wextê ku merî mêlê xwe baş dide wêne, merî dibîne ku baranî zuda ye ku nebarîye. Erdî wek çolên Afrika zîwa bûye û axî di bin tîrêjên rojê da zer dike. Zerîyê payîzê. Zerîyeke ku hîsên bi tenêbûnê dida însanan û melankolîk dike.

Însan dema ku li kincên yê di gowendê da dinêre, hema hema hemî berfangên keç û bûkan ji eynî qumaşî durîne. Wê wextê, Uskî Umê, ji xermana bi şunda, ji Samûlê purti û kinc tînan û hate xermana salê têyî bi deyn dida. Xelkê jî ihtiyacên xwe yê salê ji ba Uskê tedarîk dikir. Çêşîdên ku tînan, piranî

wek hevdû bûn loma bervangên wan wek hevdû ne. Uskî Omê purtî tenê nedifiro. Uskê firoşgehîyê tekelê dikir. Çay û cixare jî difiro.


Uskê ji önlîgî mektebeyî reş bigre, heta ku bi cawî kirasan gê ji Samûlê tîna, önlîgên herî baş Zêvê Husê didurî (dîya seroke beledîyê nûha Şahin Ateş) Yên ku herî pir bi pirtu Uskê xenê dubûn kurik bûn. Ber dukana Uskî Umê dibû meşer. Jinan dikirî û ihtiyacên malê heldibjartin.

Li şunê parka niha ku li hemberî camîyê ye, rêza dukanan habû. Dukana Uskê Umê ji aliyê kanîyê malê şêhê da (beledîyê mal ava be, kanî xeland) a yekemîn bû.

Li wê rêzê dukana Kemalî Isa (Kemal Bozkurt) hebû, têda koşkarî dikir.

Kuşoyî Mistir (Tayyar Taşci) berberi dikir. Li ser derî dukanê, Berber Tayyar nivisandî bû.

Husî Malê Xecxem (Huseyin Benli), Heskî Mehmed (Hasan Yerlikaya). Heskê hobîyê xwe, portrê însanên gund berhevkin bû. Heskê ew resimîna di çerçeweke mezin da pêşkêşî temeşevanan dikir. Çerçewe di dukanê da li kêlekî neynîkê bi darxistibû) û Qedirî Malê Xecxem (Kadir Benli) jî di dukanî wê rêzê da berberi dikir. Izzet (Izzet Deniz) seracî û hefsarkarî dikir. Mehmedî Malê Heselmên (Mehmet



Ehmed Koyuncu li ber dukanên kewn yê Xelika, Ji malpera Xelikan/Necip Demirsoy

Yerlikaya) dukanî xwe yê baqalîye habû. Qedirî Eşê Elî (Kadir Kazan) û Kemalî Hesmên (Kemal Cankaya) jî di wan dukanan da bakalî kirin.

Ber dukanan, cihê civînê bû. Heta raketinê insan li wir dicivîn û sohbet dikirin.

Sohbetên xweş û bi tam çêdibûn. Zivistanê sohbet bi piranî di hundirê dukanê da derbas dibû... Insan diketin rûhevdu, henek û kenî li navê bû.

Ê tê bîra min. Devdevê biharê û danê nivro bû. Roja cîwan mina keçikeke kezî dibiriqî. Tîrejên rojê î arengî û zindî bûn. Sor û zer xwe li hevdû mî-

na gulîyan nûr kirîbûn. Roj germ û dost bû. Buxê axê hêdî û hêdî berve ezman diherikî û xwîn li canî merîya dilist.

Insan li ber dukanan gehîştibûn hevdû û xwe dabûn berroj û kom bi kom sohbet dikirin. Li ber dukanê Kemalî Îsa, Bilkê Bilî Hucê (Bilal Yaşar-Bilê wê demê hukuk dixwand) yî bi Idî Malê Îdê (Îdriz Kilicalp) ve ketine munaqeşeke kûr û çend kes guhdidine ser wan.

Min jî li ber dukanê Izzet, guh dida ser Mehmedî Elê Simo û Hesî Elê. Herduya jî sohbeta xwe xweş bû û hevalên hevdû yê bi salan bûn. Hesî Elê, jêhatbûna xwe î jî karanîna ço ra dipesand. Mehmed pêçakê guh da ser Hesê bi şunda Mehmed:

– Hesê, tê bi min re werî rakî ço?

– Mehmedê bira, ez qêmişê te nabim. Ez nawxazim ku bêheval bibinim.

Mehmed ning da ser û gotinên xwe dubare kir.

Hesê pêşmeydanxwastina Mehmed qabûl kir.

– Hesê, here mal çoyê xwe hune.

Yên ku guh didina ser sohbeta wana, tenekî din nezîkî herduyan bûn û guhên xwe bel kirin û di ber xwe da kirine biltebilt. Hes, demeke sikinî û guh da ser xwe û li seatê xwe mes kir û kuxî.

– Em ê herin li dawîya çîyayine gewr musabaqa xwe bikini.

– Dilê te kêder xwastîyê. Dixwazî,

em ê helkişinî serî çiyê.

– Kî ku te jî serî çiyê dîne.

– Awê qolê, hele tu here çoyê xwe hune.

Hesê li dor alîyê xwe mes kir û got:

– Çoyê minî di dest te da ye.

Yên ku guh didan ser wan xwe bi ken kuştin. Memhed jî pir kenî.

Huco, navê xwe yî di kutukte çî bû min hîngê jî wek îro nedizanî. Ne pêwîst e ku ez bizanim jî. Navî wî Huco bû. Ji min re Huco wek însan û hunerên wî hêja bûn û hêjane.

Hucobimalbataxweveji Gordoglu yê hatin derxistinê bi şunda, li gundî me-Xelika Jor- demakê jîyan. E tê bîra min. Huco û malbata xwe di xanîyê mala Eşê Elî da wexteke man û dure barî Kulekê kirin.

Tarlê me nezîkî mala Eşê Elîyê, wextê ku ez diçûm tarlê, dengî zurna Huco zîz û zîz dihat. Ez li kêlekê malê dadiwastîm û min guhdida ser zurnê. Ziravên ku Huco lêtêxist ziravên xemgîn, giran û melankolîkên mîna Were Komê û Xelo bûn.

Xelk yê xwe dide ser serî xwe, em lê çir dikinî! Ludwig van Beethoven, Wolfgang Amadeus Mozart û muzisyenê din ên bi nav û deng di gundê xwe da jî alî mîr, beg û axan da, dihatin

xwedîkirin, parastin û wek hunermend qedir û qîmetên xwe habûn.

Pifî zurnê kirin, ji bo Huco ragihandinek bû. Ragihandineke bi hundirî xwe ve, doralîyê xwe re û bi hêzên li ezman re bû. Huco berî ku li zurnê xe, cixara xwe dikire navberî tilîyên qelaquçikê û gustirkê. Huco yî yarê ziravên xemgîn bû. Ji ber wê yekê jî zurna Huco yî dirêj bû. Wê demê li daweten mêr pîranî li odan rûdiniştin û sohbet dikirin û Huco ji wanan re resîtal dida û li ziravên giran têxist. Ziravên mina Emê Hemê û Qamişî Qul.

Huco bi zurna xwe re dibû heval, dost û yar. Tilîyên wî mîna lêkolinvanên jêhatî li ser qulan li dengên nû digerîn. Bi giranîyê dest pê dikir û sêgavîyê, şarxoş barî û hewayê din berdewam dikir. Di navbera govendê da kilam jî digotin. Kilamî xwe yê populer Sulda Ele bû.

Dema ku Huco ji xwe diçû, wî wê gavê komunikasyoneke qutsî bi govendê re bi dest texist bi teybetî jî bi sergowend re. Wê wextê gowend wek ayîneke pîrozwer dibû. Huco mina din-darekî Zerduştî ku Haoma vexwarî ji xwe vedikî û bi zurna xwe ve dibû yek û derdikete qatî ezmanî hefta. Govend, Huco û Dohlci li hev digerîn, dibûn yek gilok û enerjîyêke şenayê di nav gund da belav dibû.

Hele ziravî bûkê. Hele ziravî bûkê yî û li serîniyê sibê zû. Ê merî ye regerîne û çol û bi çol bigerîne. Çi guneh hene ê bi însanan bi kirin bike.

Xemgînîya mala keçikê û şabûna mala lêwik, mîna gulîyan li hevdu dihûnand û hewayê serin dengî zurnê yî mîna orkestrakê li ser gund digerend.

Berê bûk sibê zu dertêxistin. Bûk li ereba hespan sîwar dikirin, di dor goristên re çerxkirin bi şunda, li malê zêve peya dikirin. Zava, li mala ke merlixî yekî heta wextê nikahxwandinê dibû mewan.

Ziravên Huco, hekatê tarîx û guhertinên jîyanê bûn. Ziravên Huco insan wek hêzekê dikşand û pêşîye hevî û xeyalên ku dikelîn vedikir û diherikand. Yek caran dihat bîra min û li ser difikirîm. Min bi xwe û xwe digot: di-be ku ziravên zurna Huco, me bi nasnameke kevn ku şopên xwe di mejoyî me da heyî tîne ba hevdu. Di ruhî insananda herdem hewesê rojên ciwanîyê heye. Çimkî rojên ciwanîyê demek e ku mirin nayê bîra insanan. Wexteke zindî ye. Demek e ku hemî hîs li ser lîngan e. Destpêkek e ku av li didan dihilîze.

Muzika Huco berdewamî ye û nemerîye jîyanê tîne bîra insanan. Çimkî kokî ziravên Huco yî digihê Mitolojîya Mîtra û dîne Zerduşt. Huco tenê li Emê Hemê û Qamişê Qul nebû. Huco zi-

ravî giranî û sêgavî bi sed çeşîdî lêtexist û şorên wan ziravan ne tunebûn. Bi tenê ziravê bûn. Navî govend û gavendê bawer im ê ji sergovendên Huco yê li her gundekî belî bûn. Hesê Elê, Milê Hesê, Yexmik (Ahmet Koyuncu), Mistefeyê Qewê hîn çend kesên din ji Xelike Jorê favoritên Huco bûn.

Ji bo govendeke baş, dîalokeke xweş di navbera hunermend û sergovend de gerek e.

Jo bo wê sergovendî giring e.

Hesî Elê sergovendekî teybetî bû. Pozî merasî xwe yî tuj di erdê re dikir û desmalê xwe giran û giran li ser pî rastê û çepê ba dikir û ji rêzê govendê derdiket bi tenê û bi qurim govend dikşand. Ji xwe diçû û di bin simêlan re dikenî.

Huco gund bi gund digerî. Gundên di navbera Ankara û Konyayê da piranîyên xwe gundên kurda ne. Huco li wan gunden hemiyar li zurnê têxist. Ji bo ku zurnecîyekî bi nav û deng bû xwedîyên dawetê diketin navê. Hingê hejmara insanên ku li gundan dijîn ne mîna îro zêda bûn. Yanê li gundekî şeş û heft dohl bi hevdu re lênediketin.

Hevaliya zurna Huco, Kezo bi dohla xwe dikir. Kezo simbilpîjîk û dirêj bû.

Guhên xwe kêmbihîst û hem jî ker bû. Lê li dohleke xweş texist. Bi dohlê koreografîyên pir estetîk peyda dikirin.

Hunerê Kezo yê herî baş; orxan li

ser tilîyeke çerx dikir û di eynê demê da jî li dohlê texist. Darî dohlê li ser çermî dohlê mîna tilîyên pianistekî digerland û dengên teybetî dertexistin.

Birayê Huco Zîya pîr caran bi Huco ve bi hev re li zurnê têxistin û Zîyê î pîr li qirnetê têxist.

Huco folklorê kevn. Mirasên kevn tîna îro û nesîlen nû bi kultura xwe ve û nasnameya xwe tîna ba hev û gund bi gund li nav kurdên Anatolîyê belav dikir.

Kilam û ziravên heremî li cihên din bi naskirin dida û dibû wesitayî berhem guherînê.

Kultureke netavî û hêjên hevpar ji bo kurdên Anatolîya Navîn dadigirt. Ziravên ku li Xelika dihate naskirin li Omera, li gundî Bulduk, li Incovê, li Xelika Jêr, Germikê Heserê, li gundên Heymanê, Balayê, Yunakê, Cihanbeyê, Golbaşîyê û li gundê din jî dihate naskirin.

Nasnameya çandî qelaw, zindî û bi-hêz dikir. Hisîyê komê yî natewî diprast, pêş de dibir û bi hêz dikir.

Teknolojîyên ragihandinên îro pêş de çûne. Di dema ku Huco aktiv bû, ne televizyon, ne teyp û MP3 habûn. Huco bi zurna xwe mîsyoneke giran pêk danî.

Mala te ava be Huco!

DANÊ NÎVRO

mîh dutin
şîr li makîne kirin
şîr meyandin
qew şuştin
zikên kurikan têr kirin
xwarina şivanan hazir kirin
ji karên nîvro bi şunda
ji bo ku piçekî vehêsin
jinên mehelê li siyê gomê runiştin
û ji bo ku satûgav ji ber mêra ranebin
beriyên xwe berve diwarî gomê û piştên xwe di rê alkirin
penç şeş jin bûn
piraniyên wanan dêûdotên hevdû bûn
henekan ji wan derguşên xwe dimêjandin
(xwêye henîyê xwe yê ku hing ziwa nebû, diçilîkî ser canî derguşan)
henekan ji teşî dirêsandin
sê car zarokan seriyên xwe dabûn ser junîyên dayîkên xwe û di bin bervangan
da ketibûn xewê
jinan çerçîyek ku di kêleka wanan re derbas dibû bi dawestandin dan
û bi heriyê hurik ser bi ser muj û lelebî ji xwe re kirîn
sohbete wanan bi rojevên rojanî dest pêdikir
ji ber ku dawiyê havînê bû
babêtên sohbetên jinan pir caran li ser dawetên ku yê bibin bû
wanan qala qeling û relê bûkê dikir û dîtînen xwe rêz dikirin
û muneqaşê direj dibû
lê ci dibe ma bibe jinan şor çerx dikir, verdigerandin, niş dikir, lût dikir û tîne
ser derd û kulan û kilamên dilan
wê demê jin digihêştin xwezaya xwe bi rastî

berîyê xwe didan hundirî xwe
û ji hevdu diçûn û ji xwe vedikşîn
di nav wanan da yê şare dest bi sitrana kilameke şînê dikir
piranîyên kilamên şînê li ser keç û lawên ku bi ciwanî mirî
an jî kilamên li ser însanên ku li welatên dût û welatên xerîp mirî bûn
bi gotinên zengîn û xemgîn
ew dilên ku bi hasretan û bi janan wek rojê hatine şewitandin û dişewitîn
zu tiji û zîz dibûn
û hur û hur dibarandin
wexte ku hundirên xwe bi girî rind vedihesandin
jinekê ji wanan dest bi kilamên dila dikir
û jinên din jî yek caran xwe tevê dikirin û mina koroyekê distiran
qalîkê dunê tiji jîyan dibû
sivik dibûn
difirîn
gulîyên xwe dibûn yek çem
diherikîn
dibûn yek pêtî
dişewitîn
hîqehîqê wanan
ezman germ dikir
hesin dihelandin
şorê xwe netêvişandin
ji sêri da diketin di dawiyê re derdikatin
lê qet qalî dilî xwe nedikirin.
eşq tim a yê din bû.

Sefî Dogan

LÊ LÊ ESMERA ÇAVŞÎN

dergehên keleha sîng û berê xwe
ji stûxwariya lome
û gazinên min re veke
ez
li ser mîndera qedîfe
ya koşka bejn û bala te
rûnim
nameya kurteçîroka xwe
diyarî neynika odeya te
ya diltenik bikim
were
bi saya derenceya
dermanê awirên melûl
dakeve nav kerba hinavên
jiyana rojên min
lê lê xatûnê
li welatên xerîbiyê
li dûrî te
li koçberiyê
li kolanên bajarê sêwî
di kelejana tenetiyê de
mîna mecnûnan digirim
lê lê sîngsedefê
rengê nale nala axînên min
çîlspî ye
rengê perdeya bextewariyê
reştarî ye
baskên lorîna xewa şevan
şikestin
çûkên xewn û xeyalên şîrîn
li asîmana giyanê piştixûz
êdî nafirin
lê lê gerdenzêrê
min
berê qibleya duayên xwe
li nav toz û dûmanan

di şopa gera sînorên te de
winda kir
ji henasa qêrîna gewriyê
bêhna axa sirgûnê
difûre
karwanê evîna çola sehayê
di bendewariya germa qijqijî de
westiya
katjimêra zendê demsalên têkçûyî
rawestiya
lê lê rindê
yasemîn û nesrîna bêrîkirinan
di hesreta tunebûna te de
reş girêdan
tofanên dema bêwijdan
li ber esaleta meşa gavên min
rêz û hurmet girtin
çokên bedenê perîşan
di sernermî û dilsoziya xwe de
kût û şerpeze bûn
li paytexta rezîl û riswa
tam û lezeta silavên beyanan
genî bûn
dîwarên qonaxa şevbihêrkên şad
herifîn
laşê ferhenga gotinên rût
cemidî
lê lê dilsafê
kilîda deriyê çarenûsa xopan
qet venebû
salnameya roja dayikbûna min
pir poşman e
ez dîsa
di bêçaretiya hestên xwekuştinê de
li zîndana êş û keservedena şevên xwe
vegerîm
dengê pêlên tirsê bayê xêşim
di guhên bêxewiya nivînan de
wîzewîz e

Xizan Şîlan

2009-09-12, Stockholm

çar par

rengula min
sorgula min
bihar havîn
xweş welatê min

berfa zivistana min

rojgula min
hîvgula min
erd û ezman
Geş welatê min

hêniya çiyayê min

şîngula min
şêngula min
dost û yarim
şox welatê min

şahiya giyana min

keskgula min
reşkgula min
şîrîn şekir
niştimana min

tema jiyana min

bakura min
başura min
rojhilatim
Kurdistana min

çar par welatê min

12-10-2005
Gurdo

Tilîliyên Gernasan

Ji dûr dengê fulûteke Çermserên Emerîkî
Qala destaneke kevin dîke
Destana Apaçîyan!..
Qala şervanên ku
Ji bo ax û şerefên xwe
Bi tilîlî
Ber bi New Meksîcoyê dimeşîn.
Gerenîmo..
Serekeyê ku qet serê xwe netewandiye.
Dimeşîn.
Gernasên ku di eniyên xwe de
Mohra mirinê hildigirine
Ber bi New Meksîcoyê dimeşîn.

Dengê bilûra şivanekî Kurd
Behsa meşa mezin dîke
Qehremanên ku çek û rext rabestiyayî
Ji gêdûkên Zagrosan derdikevin
Li dor newalen dabiristine
Pêşengê wan Mele Mistefe
Li dor Rewandûz vebestine
Û dengê tilîliya wan,
Di bayê şevê de olan dide.

24.01.2010
Şivan Ar

NASNAMEYA VEŞARTÎ

Nuh Ateş

*" li ser bîrê li ser bîrê
dewla di dest da kete bîrê
xwîyê lê ketiye li ser pêşîrê
ê pak dikê bi pêşkîrê"*

Ji kilameke bi kurmancî ev çar rêzên li jor, di bîra min da mane. Ew di xortaniya min da bi ber min ketiwûn. Kilama kê ye û li ser kê hatiwû stran nizamim, nayê bîra min. Sê û çar rojan berî vê, êvarê li mala xwe, di aşxaneyê da rûniştibûm. Titunek ji xwe ra pêça, vêxist û helmek jê kişand. Li hêlê jî firek ji çaya li ber xwe vexwar. Ji niçkava va çarîna hate ser zimanê min. Min ew di ber xwe da stra û wê ez birim li nav bîraniyan gerandim. Ew bû banga nivîsandina vê nivîsê.

Min ev çarîna, qedera çel û pênc salan di ber vê li sinifa duduya li lîseyê Ticaretê ya bajarê Konyayê strawû. Tetila havînê li ber dêrî wû. Edet wû, dersên paşiyê di heyamekî bi kêf û şahî, bi sohbet û yarênîyan derbas diwûn. Dora dersa coxrafiyayê ya paşiyê wû. Dersdar jineke bi şuhret wû. Xwandekaran sewa xatirê rindîya wê, ku mecbur nediman ji dersa wê qet kê nediwûn. Dersdarê jîn hîngê pir kê nediwûn. Di sinifa me da nêzika çel xwandekar hewûn. Ji xêyrî sê û çar keçi-

kan yên mayî giştik law bûn. Lawan di dersa coxrafiyayê da ders ji bîr dikirin. Guh nedidan ser gotinên dersdarê. Bel û bel li lêvên wê yên surkirî, çavên kesk û killkirî mêz dikirin, tê bigota ew ê ku resmê wan çêkine.

Di rêza min da hevalekî tirk rûdinişt. Yekî heylaz û yarenîhez wû. Wî destê xwe helna û ji dersdarê destur xwazt. Dersdarê destur daye. "dersdara min, ez teklif dikim ku nuh ateş kilamekê bi kurmancî bistrê!" wî bi tirkî got. Ez bi teklifa wî mehçûp bûm. Min di bin ra bi mistê li ser hev kuta tenişt a wî, lê ew ji ya xwe danegerî. Dûv ra xwandekaran giştikan dest li hev xistin û bi tirkî gotin "erê, dixwazin!" û pê ra jî hîk û hîk kenîyan. De tu ware, ji heyamê li sinifê weng xuya dikir ku di binî xwaztina wan da qirfêkîrin jî hewû. Min bi serî bakirina xwe da zanîn ku ew teklifa ne bi dilê min e. Lê wan neterikandin û bi israr dane pêy xwaztina xwe.

Li ser vê teklifê, dersdarê di serî da mirûz tahl kir û rûyê xwe qerçimand. Ez bi nerazîbûna wê şa bûm. Lê paşê, li ser israra xwandekaran wê dil kir û got "de, ma bistrê!" Ez mam bi serê xwe. Min mêz kir ku çare tune û ji xwe bi xwe re got, "bistrê û jê xelas be!"

Min ji fedîyan ra li rûyê kesî mêz nekir, serî kire ber xwe û ev çar rêzên li jor stran. Lêbîlem ez di bin xwîyê va bûm û dilopên xwîyê bi ser cênigên min da berjêr lut diwûn û dihatin xwarê. Guhdaran bi ken û qirf û bi destlihevixistinê refekat kirin. Bi stranê newû, vê carê jî xwaztin ku ez kilamê ji wan ra tercume bikim. Min ew jî kir.

Qasî ku di bîra min da maye, di sinifa ji çel xwandebaran du kesê kurmanc wûn. Ez û Mistefa Başaran yê ji gundê Cudikên Yapaliyê. A xwedê ku Mistefa wê rojê, ji ber nexwaşiyê nehatiwû mektewê. Ew ji bo tiştî weng pir hasas wû. Dora dine rojê, wî bihîst û hate ba min got "lo malneketo, te xwe şaş kiriye, tu radi bî ji tirkan ra bi kurmancî distrêyî û me piçûk dikî! Ez bûma, ku bi çuwalan zêr li ber min velokirina jî, min ji wan ra nedistra!"

Çima wî wer got û çima min ji ber strana bi kurmancî weqas pir fedî kir?

Hîngê ji gundên kurmanc yên li nava Anatolîya û bi ser qezayên Cihanbegli û Kuluyê va pir xwandebaran li bajarê Konyayê dixwandin. Nezika sî û çel xwandebaran kurmanc li her du lîseyan, lîseya ticaretê û lîseya xortan bi qeyîd wûn. Pîraniya wan bi serî xwe wûn û bê dê û bav, kom bi kom di xaniyên kirêkirî yan jî di pansiyonên xwandebaran da diman. Dê û bavên wan yekcaran dihatin ser wan û bi xwe ra tiştên xwarinê dianîn, xercîya wan

didan, kinc û mincên wan diştin.

Xwandina li bajêr û li lîseyan nediwû para her kesî. Lewma xwandebaran kurmanc yên dewra min gîştik bi xwandina xwe û bi nasnameya xwe ya xwandebaranîyê razî û serbilind wûn. Lê ew ê, ez jî tewê, ji ber du nasnameyên xwe yên din ne rehet wûn. Wan ji ber nasnameya kurdîtiyê û ya gundîtiyê fedî dikirin. Hetanî ku ji destê wan dihat, ev her du nasnameyên xwe, pirtir jî ya kurdîtiyê vedişartin. Aşkere li wan xwedî dervediketin.

Nasnameya gundîtiyê li gorê dîtina hîngê mîna nasnameya tebeqeya jêr û dunênedîtiyan dihatê hesibandin. Lewma xwandebaran lê xwedî dervediketin. Ew Ji nasnameya kurdîtiyê jî dûr disekinîn, çima ku ew wekî nasnameyeke cihê di qadê resmî da nedihate qewûlkirin û bêqîmet dihatê dîtin. Nimûne, wan li ber xwe didan ku li derva, li derên resmî bi kurmancî deng nekin. Henan jî, wexta ku dayikên wan dihatin ser wan, bi wan ra bi rehetî û dilxwazî nedîçûn çarşî û bazaran. Çima ku wan xef-tan li xwe dikirin: Zewûn, çux, salte, berbank, şar û kitan, kincên wan yên rengin, bi neqş, çîn û çirtik nasnameya kurdîtiyê didan dest.

Ji hêla nasnameya dînî da tu serêşî tune wû. Çinkî ew jî wekî tirkên wê cîwarê musluman û li ser mezhebê heneftîtiyê bûn.

Di veşartina nasnameya kurdîtiyê da hen kes jêhatî û bi tale wûn. Mesela yên ku

bi tirkîyeke rind û bê aksan deng dikirin. Yên weng, ku bi ser da can û çêrmê wan tenekî gewr û yan zer wû, kurdîtîya xwe nedidan der.

Lê veşartina nasnameya kurdîtîyê her dem û ji bo her kesî ne mumkun wû. Nimûne yên mîna min e esmer, poz kertel, qirik kurmanç û tirkîyeke bi aksan deng dikirî bi şîya nedikirin ku xwe veşêrin. Ku ne bi dilê wan biwa jî ew wekî kurmanç dihatin nasîn û daxkirin. Ji ber vê, pir kesan li mektewê dizanîn ku ez kurmanç im û carnan bi bernavê "kürt" (kurd) bange min dikirin. Ji avûrûyê qirika min da kurdîtîya min tavile dihate kevşkirin. Lewma carna ez mecbur dimam ku li kurdîtîya xwe xwedî derkevim û barê wê li xwe nim.

Veşartina Nasnameya kurdî ji qimetnedayîna wê tê. Ji înkarkirina ziman, tarîx û kultura kurdan tê. Nasnameyên veşartî nasnameyên nenas in. Xwediyên wan jî pir caran jî hay ji wan neye. Wê wextê, ne min ne jî hemsaliyên min, me li ser nasnameya kurdî û bendkirina wê û çerxa asîmîlesyonê tu tişt nedizanî. Me hay jê xênetiyên ku li kurmançan hatine kirin tune wû. Em qet bi ber da nedîçûn ku nasnameya xwandekariyê û sistema perwerdeya Tirkîyeyê me çing ro bi ro ji kurdîtîyê bi dûr dixê. Nasnameya kurdî sed sal e bendkirî ye û tê êşandin. Dilê her kurmançekî pir û hendik bi vê êşê daxkirî

ye. Ev dilêşandineke weqas giran e ku her dem bûye û dibe sebeba hing û şerên aşkere û bi dizî.

Rojekê xwandekarên di sinifa min da li cîyê xwe rûniştibûn û benda dersdarê dipan. Min jî li ser textê reş, çî wû nayê bîra min, tiştêk dinivîsand. Serdarê sinifa me yê ku bi du û sê bihostan ji min dirêjtir wû, bi tirkî, lê bi dengêkî bilind ez azar kirim û got, "li cîyê xwe rûne, kurd çî dizane binivîse!" Bi van gotinên wî yê bi heqeret ez pir êşiyam, pê heta dêv hatim. Min xwe zept nekir û ez mîna brûskê berizim wî. Ez helfirîm û min bi misteke pît li ser pozê wî xist. Cîlê xwîn bi ser ket û wî ber xwe nedît. Heval ketin navbera me û em ji hev bidûr xistin. Di wê navberê da dersdar kete hundir. Xwîna li herdê bi ber çavên wî ket. Pirsî û got, "çir bû, çî qewîmî?" Çend xwandekaran bersiv dan û gotin, "du hevalan bi yarenî bi hev girtin, pozê serdarê sinifê xwîn bû!" Bi vî awayî rê lê kirin û ser rastîya meseleyê nixmandin.

Çend roj ketin navberê, min û serdarê sinifê li ser vê hinga me deng kir û em li hev hatin. Wî qebehata xwe qebl kir û bexşandina xwe xwazt, min jî gilîyê poşmaniya ji reaksiyona xwe kire ber.

Mainz, Elmanya 14.02.2010

Çanakkale'deki Orta Anadolu'lu Kürt Memo'lar

Muzaffer Özgür

Çaneqelê Çaneqelê
Şûna avê xwûn dikele ⁽¹⁾

Yöremiz Kürtlerinin bu kanlı savaşta yer aldıklarını yaşlılardan çok sıkça duyar, yörede söylenegelen ağıtların var olduğunu biliyoruz. Amacımız diğer tüm konularda olduğu gibi bu konuda da yöremize ait bir tarihi gerçekliği yazıya aktarmak. Yaşlılarımızın olayları anlatırken zaman zaman yanlışlara düştüklerini, savaşları karıştırdıklarını, Yemen cephesinde ölen birisinin çanakkale'de şehit olmuş gibi anlattıklarını da biliyoruz. Bu konuda devletin kayıt altına aldığı arşivler kanalıyla sağlıklı bilgiler edinmenin yanında sözlü kaynaklara da yer vererek küçük de olsa bir arşiv yazısı hazırlamak temel düşünceydi. Bölgede alan araştırması yapma olanağımızda şimdilik yok. Umarım başka araştırmacılar, tarihçiler, öğrenciler, yazarlar, askeri strateji uzmanları devletin ana arşivlerinden ve bölgede yapacakları alan araştırmalarıyla sağlıklı bilgiler ışığında daha detaylı bir çalışma yaparlar.

Bu yazı son dönemlerde “*Kürtler Çanakkale Savaşında savaşmadılar*” gibi milliyetçi, ırkçı, işi kafatası ve kefen sayısına bakarak açıklamalarda bulunanlara cevap olsun diye hazırlanmadı. Tarihsel doğruları çarpıtanların zaten vicdan ve akıla sa-

hip olmadıkları aşikardır. Bu yazının hazırlanmasındaki temel amaç sadece ve sadece tarihi olgulardaki gerçekleri yöremiz bazında örneklendirerek yöre arşivlerini hazırlamaktır.

Çanakkale savaşını (Cephelerini) kısaca şöyle açıklayabiliriz. I. Dünya Savaşı sırasında 1915-1916 yılları arasında Gelibolu yarımadası'nda Osmanlı Devleti ile İtilaf Devletleri arasında yapılan deniz ve kara savaşlarıdır. İtilaf Devletleri; Osmanlı Devleti'nin başkenti konumundaki İstanbul'u alarak boğazların kontrolünü ele geçirmek, Rusya'yla güvenli bir tarımsal ve askeri ticaret yolu açmak, Alman müttefiklerinden birini savaş dışı bırakarak İttifak Devletlerini zayıflatmak amaçları ile ilk hedef olarak Çanakkale Boğazı'na girmişlerdir. Ancak saldırıları başarısız olmuştur ve iki tarafın da çok ağır kayıplar vermesiyle İtilaf Devletleri geri çekilmişlerdir. Bu savaşta Osmanlı ordularında imparatorluğun tüm bölgelerinden, tüm halklardan insanlar omuz omuza savaşmış, Osmanlıyı kurtarmaya çalışmışsada I. Dünya Savaşı sonrasında İmp. yıkılmaktan kurtulamamıştır.

Bu savaşta Osmanlı'nın kayıpları (60bin ölü, 100bin yaralı, 10bin kayıp, 21bin has-

talıktan ölüm, 64bin hasta, toplam kayıp; 250bin) bugünkü Türkiye resmi idari yapısına göre kayıt altına alınmış şehit sayısı 48148'dir. Afganlı, Pakistanlı, Rum, Laz, Ermeni, Azeri, Acem, Arab, Filistinli, Kürt ve değişik balkan milletlerinden olanlar ve Kafkas kökenli olanlar, hatta Almanlar dahil değildir. Şehitler açıklanırken bu saydığım halkların varlığı bugünün siyasi mantığıyla hazırlandığı için arka plana konulmuş ve burada savaşın başarısının Türklere mal edilmesi için diğer halklar yok sayılmıştır. Eğer Osmanlı'nın toplam kayıp sayısı yukarıdaki gibi ise ve tespit edilen sayıdan taramalar sonucunda diğer halkların sayısı çıkarılsa bu başarının Türklerin değil Osmanlılığın yarattığı toplumsal birlikteliğin sonucu olduğu ortaya çok net çıkar. Bu savaş sonucunda Çanakkale geçilememiştir, fakat sonrası savaşlarda bölge İngiliz ordularınca işgal edilmiş ve karış karış kontrolleri altına girmiştir.

Arşivlere bakıldığında ölenlerin bazı bilgilerinin tespit edilemediği de anlaşılır. O günün savaş koşulları ve ülkenin yapılması gözönünde tutulduğunda bunun normal bir durum olduğu anlaşılır. Köyü tespit edilemeyenlerin bağlı buldukları il, ilçe merkezine-askerlik şubesine kayıt edildikleri anlaşılır bir durum. Buda il, ilçe merkezlerine kayıtlı insanların sayısını arttırmış. Bu nedenle verdiğimiz rakamlarda ilçe merkezine kayıt edilen askerlerin önemli bir sayısında Kürt kökenli olabileceğini hesaplayabiliriz.

1915'li yıllara yazılı kaynaklardan bakıldığında Orta Anadolu Kürtlerinin ö-

nemli bir kesimi köylere yerleşmiş, hayvancılık ile yaşamlarını idame ettikleri anlaşılır. Haymana İlçesi bölge Kürtlerinin ana merkezlerinden biri konumundadır. Kürt coğrafyasından kopuşun olduğu, ciddi bir nüfusun bölgede yerleşik olduğu görülür. Bunun da küçük köylerde genellikle aynı aşirete bağlı insanların kümelenmesiyle gerçekleştiğidir.

O günkü Haymana ilçe merkezi bir köy gibidir. İlçe merkezine kayıt edilenlerin sayısına bakıldığında rakam o dönemdeki nüfusa göre çok fazladır. Yörede anlatılan fakat arşivlerde bulunmayan kayıplarda bizi doğrular nitelikte. Soyadı olmadığı için lakap ve baba adı ile kayıt altına alınanlar eğer ilçe merkezine kayıtlandırılmışlarsa iş daha da karmaşık bir durum alıyor. Aşağıdaki bilgileri değerlendirirken, oranları, yüzdeleri gözönünde bulundururken ülkenin o dönemdeki nüfusunu, bölge Kürtlerinin bu nüfus içindeki oranını da gözönünde bulundurmak gerekir.

Tarihi gerçeklere baktığımızda Osmanlı-Kürt ilişkilerinde, Kürtler Osmanlı'ya ittifak politikalarına göre hep sahip çıkmışlar. Osmanlı'nın çöküşü ve paylaşımı yapılırken ulus devletlerini kuran halklar Osmanlı sömürsünden kurtulmuşlardır. Kürtlerde ise islamın -ümmetçiliğin- etkisi ile bağımsızlık kavramı tam olarak toplumsal yapıya kavuşmamıştır. Osmanlı'ya ve İslamı sahiplenme ulusal gelişimlerini olumsuz etkilemiş ve uluslaşma süreçlerini tamamlamalarına engel olmuştur.

1911'dan-1922'ye kadar aralıksız devam eden Trablusgarp, Balkan, Yemen Savaşları

ve hemen sonrasında gelişen Birinci Dünya Savaşı'nda ve Kurtuluş Savaşı diye adlandırılan savaşlarda pek çok Kürt Osmanlı ve sonrasında Ankara yönetimi ordularında görev almıştır. Binlercesi şehit olmuş, yaralanmış ve kayıp olmuştur. Anaların, bacıların ağrıları bu kayıpları çok acı bir dille anlatır. Buna bir örnek verecek olursak;

Dilê min kela germîyê

Sar nabê bi ava Kanîya

Eza qûrbane recalî malê bavî xwe bim

Qevasê malê bavî min ramedî ye bi panîye⁽²⁾
)

Bu çalışmada Orta Anadolu Kürtlerini ele alırken, Aksaray, Ankara, Kırşehir ve Konya İllerini temel aldık. Arşivlerden bu illerdeki rakamları seçtik. Bunun yanında o dönemde değişik il ve ilçe sınırları içinde bulunan Kürt yerleşim birimlerine ve

oralardan olupta bu savaşta ölen kimselere yazımızda yer vermedik. Bilindiği gibi bu illerin dışında Orta Anadolu'da; Eskişehir, Kastamonu, Kayseri, Sivas, Amasya, Tokat, Sinop, Kırıkkale, Çorum ve Yozgat gibi değişik illerde de Kürt yerleşim birimleri mevcuttur. Bu illerden de savaşa katılan Kürt kökenli bir hayli insan var. Buna da birkaç örnek verecek olursak;

a)Kastamonu ili, Tosya ilçesi, Yağcılar köyüne kayıtlı, Kürt İmam Oğulları lakaplı. Er Ömer oğlu Ahmet (1295), 26.8.1915 tarihinde şehit olmuş.

b)Sinop ili, Gerze ilçesine kayıtlı, Kürt Ali Oğulları lakaplı. Ali oğlu Hasan (1305), 22.5.1915 tarihinde şehit olmuş.

c)Yozgat ili, merkez ilçesi, Tayip köyüne kayıtlı, Kürt Musa Oğullarından lakaplı. Piyade Çavuş Haydar oğlu Ali (1296), 08.9.1915 tarihinde şehit olmuş.

AKSARAY

Sıra	D.Yılı	Adı	Baba Adı	Lakap	İlçesi	Köyü	Ölümü
1		Ahmet	Battal			Salmanlı	22.06.1915
2	1299	Hacı Emin	İsmail	Haciosmanoğulları		Karakaya	25.05.1915
3		Halil	Mehmet			Cerit	17.04.1915
4	1306	İsmail	Hasan			Kalebalta	26.04.1915
5	1307	Mehmet	Hacı Osman	Sarıvelioğlu		Babakonağı	17.04.1915
6	1305	Mehmet Sait	Mustafa	Küçükagazade		Alayhanı	27.09.1915

Toplam şehit sayısı; 285, İl merkezine kayıtlı kişi sayısı; 168

